

Sernivîser
Qado Şêrîn

Derhêner
Xorşîd Şûzî

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûri



hejimar '19'

Çırya Paşî 2013

شهرية تصدر عن رابطة الكتاب والصحفيين الكورد في سوريا

Arşevê Oskan

Wey xuelî li serê me nivîskaran be



Pêşiyên me gotine: "Ku tu li nav goristanê razê, tê xewnên xirab bibîne". Li vir piştrast dike, ku akam û bandora cih li ser mirovan heye, lewra ji roja ku ez hatime Almaniyayê ev bûn bîst salên min, min bi çav û guhê serê xwe ecêbên giran û serpêhatiyê balkêş dît û bihîstin.

Mirov dikare van serpêhatiyên mîna kaniyeke dewlemend di nivîsê de biherikîne û dawî nayê. Li welatê me fedî û şerma civatê, rê li ber gelek tiştan digirtin û jiyana kesên bi sînoriya dihişt, bê guman aliyekî xirab û aliyekî çak ji vê pîrsê re heye, lê ji ber ku çav û ruh û guhê mirovên me pîrçî mabûn, hatin û ketin nav vê jiyana bê sînoriya, vê dabaş û kultura tevlehev, li viyalî û wiyalî dilikumin, dikin û nakin dawîya vê birçîbûna pîr nayê, dibe jî heyênî mirina insanê min berdewam bike. Dîsa gazin ji van kesên milî û nezan nayê kirin, ku gelek ji wan jinên xwe berdane û gelek jî hîna ji bo wê pîrsê di gumanan de dijîn.

Bi taybet jî, di nav xelkên me yê ku bi nivîs û hunerê ve mijûlin, wanê ku dibêjin zewqa wan bilind e –xwedê giravî- Ji dema ku enternê û telefonên belaş ketin malan, bi xwe re agir jî berdane malbatê. Gelek poşman bûn, ku jinên xwe fêrî bikaranîna van alavên malwêran kirin, hey kes nama kare bi keçên xwe. Gelek jî ji wan, heta destê sibehê nema razan, bi keçan, jinên bi mêr, jinbiyan, jinên Efrîqî û jinên Rûsan....h.w.d .

Ne pêwîste, lê ya pêwîst divê mê be û hew. Zar û zêçên xwe jibîr kirin, hingî ketin nav van hewildanan, nema bi jinên xwe amin dibin ku wan bişînin dikanan. Herwisa dest ji kar û xebatê berdane û ketin ser nanê sosyalê û derîkê xwe zivirandin. Ketin nav xewn û gumanan, nema bawerîya wan bi serê wan jî tîn...

Min berê jî bihîstibû, ku xwendevanên me ji welatê rût û tazî, berê xwe dabûn Rûsiyayê û li wir ketibûn dabaş û tora dilê xwe û bi serxoşî ji hişê xwe çûbûn, xwendina xwe nivco hiştibûn û dest bi karê qaçaxiyê kiribûn, yan jî ketibûn tora mafiyayan, piştî çend salan hatibûn kuştin, yan hatibûn windakirin û çiroka jiyana wan bi dawî hatibû. Gelek jî, berê xwe dabûn Almaniyayê û li vir mafê penaberîyê xwestibûn û navê xwe guhertibûn û hetanî deh salan bi tirs

dijyan... ez serê we bi van çîrokmîrokan pir ne'êşînim.

Li vir ez jî, wek nivîskarekî xwedan girafê û taxim, ji welat hatim û ketin nav vê xirecirê, min dît ku çîrok û çîvanokên wan rewşên bîrên me, yê me ew mîna pêxemberan didîtin, qal û bahsa jinan e, jin û zarok hebin nebin ne giring e, ya giring ew e, ku çend dostikê wan hebin û her ku dostik pîrbûn, pozê wan jî bilindtir dibe.. hingî ji min re jî hat gotin, min ew kêmasî li xwe qebûl nekir, û li dostikeke xwe geriyam, bêje min emêla yekê peyda kir û pê ketim têkilîye, min hemû tiştên xwe bi xwarî jêre got, nav, emir, bejin û.. Ji bo ku wê bixapînim, lê min nizanîbû ku temenê wê di xapandina mêran de bihurîbû, digel ku wê jî, dizanîbû ku ez derewan lê dikim.

Hingî ez li ser misincirê germ kirim û wênayê xwe bi kamîrê re şanî min nekir, lê ji min re wênayekî xwe yî berî bîst salan şand. Dema ku temenê wê sî sal bû, min di dawîya her şevê de jêre « xewnên gulgulî » ji qewla Qado Şêrîn ve dixwest...

Min nema xwe girt û doza hevdîtîne lê kir, wê xwest were bajarê min, min jî navnişanek jêre nivîsand, ku were li banhofê li rexê çepê li serê kolanê bisekine, da ku ez di seat 0ê de, werim û wê li wir bibînim. Wê şevê ji kêfa xew neket çavên minî bendewar û di wê rojê de, kêlikên min pir giran derbas dibûn, xwarin nema di ber min re diçû, min bi dehan sozên bi hevalên xwe re beravêtî kir û qurmiçand, min dest ji civîna partiyê berda, min xwe bi kirîna cilan talan kir, lê ku ez hatim û min ew li wir dît, bi wî çakête sor –wekî ku me berê ji hev re nişan kiribû- ku pîreke 50î salî, rû qermiçî, çep û rast çavê xwe bi lez, li min digêrîne û xortek di temenê min de jêre dibêje dayê, li rex wê sekiniye.

Min di jina min bi hezar qatî jê xweşiktir e, min ji xwe re got : wey xuelî li serê me be. Ez di ber wê re derbas bûm û lê nesekinîm, wekî ku wê nasnakim, di aliyê kolanê yê din re vegeyîyam malê û du rojan di xew de mam, piştî ku ji xew rabûm û hişê min hat serê min, dîsa min çavê xwe li yeke mê gerandin.

Ji erşeva nemir Arşevê Oskan

Qado Şêrîn

Ji bo Arşev

Min giyanê te li ser refikê dilê xwe bi cih kirîye

Xema giyanê xwe yê nazik nexwe

Ez bi nazikî wek emanetek bê hempa

Û wek ruhniya çavan

Carinan radesû xoşewîstên te dikim

Ji bo min tuştê nehatiye guhertin

Berê jî me her ji sedsalekî hev didît

Dîsa jî emê di deryaya vê sedsalîyê de hev bibînin

Dêmek em nêzîk hev dibînin

Emê hemû bên ba te

Li bende me be

Û ana bi xatirê giyanê te..

Hollenda, 22/11/13

Ji bo şahiya yeksaliya Arşev hatibû nivîsandin

Helbest: Cemîl Darî Werger: Lava Derwêş

EY BA

Ev ba bi min difîze

Heger ez rabûm

Ew min rûdinîne

Û heger ez razam

Ew min şiyar dike

Û heger ez mirim

Dilê wî li min hênîk dibe

Ber bi ku ve birevim?

Aya reva min sûdedar e?

Mînaka doh.. doh

Min dîwarek ji qûmê ava kir

Ba lê rabû

Wek ku tunebe

Û mîna bêhişekî tîqtîq kir

Û ez li cihê xwe

Siya xwe himbêz dikim

Û goreya xwe ya rizî bihev ve dikim

Bi herdu destan min dem girt

Lê mîna avê xwe vedizî

Na .. na

Gelekî li vir nemîne.. ez bi bê re çûme

Tu jî here



Tu dizanî ?


- 19/03/1984 Arif Beg koçkir , li Dugirê veşartin.
 21/03/612bz Cejna Newroz
 23/03/2002 Seydayê Tîrêj çû ser dilovaniya xwedê
 21/03/1986 yekem car li Sûrîyê li Şamê, Newroz
 bi xwepêşandan hat pîroz kirin . û Silêman Adî bû yekem şehîdê Newrozê
 24/03/1994 şewata zindana Hisîça
 24/03/2002 Seydayê Tîrêj koçkir
 25/03/ 1975 serokê serhildana A girî Ihsan Nûrî Paşa mir
 31/03/1947 Qadî Mihemed li meydana çarçira ligel hevalên wî bi darvekirin
 31/03/..... roja bîranîna şehîdên kurdistanê
 21/04/1954 Civata yekîtiya xortên demuqratên kurd li Qamişlo hat damezirandin.
 22/04/1898 Cejna rojnamegeriya kurd.(M.M.Bedirxan rojnameya kurdistan li Qahîre).
 01/05/..... Cejna karkeran
 15/05/1932 Hejmara yekem ji kovara Hawarê li Şamê hate belav kirin
 28/05/1995 Tehsîn Taha li Holenda çû ser dilovaniya xwedê.
 14/06/1957 Damezirandina yekemîn partiya kurd li kurdistana rojava(Sûrîyê).
 29/06/1926 bidarvekirina Şêx Seîd Pîran û 46 hevalên wî.
 04/07/1992 Parlemanê kurdistana Başûr hate lidarxistin.
 10/07/1948 Mihemed Emîn Zekî koçkir.
 11/07/1909 Bûyîna Rewşen Bedirxan li Qeyserê-Anadolê.
 13/07/1989 Dr : Ebdîrehman Qasimlo li Viyena bi destê Îraniyan hate kuştin.
 15/07/1951 Mîr Celadet Bedirxan koçkir
 05/01/1905 Bûyîna Apo Osman Sebrî.
 8/10/1958 vegera nemir M.M.Barzanî ji Sovêtê
 22/01/1946 Qadî Mihemed komara Mihabad ragehand
 14/02/1925 şoreşa Şêx Seîd Pîran
 01/03/1979 Barzaniyê nemir çû ser dilovaniya xwedê
 03/03/1193 Selahedînê Eyûbî li Dîmeşqê çû ser dilovaniya xwedê
 04/03/1927 Ehmed Parafî bi darvekirin (şoreşa Qetena).
 06/03/1975 Peymana Cezairê.
 08/03/1910 cejna jinan (kongirê Kobinhagin jibo jinên ku şehîd bûbûn li Şikago).
 09/03/1989 Mihemed Şêxo çû ser dilovaniya xwedê
 11/03/1970 Beyana 11 avdarê ku kurdan mafê Okonomî li başûr girtin
 12/03/2004 Serhildana Qamişlo.
 13/03/1974 Leyla Qasim bi darvekirin
 16-17-18/03/1988 kuştara Helebçe
 24/07/1923 Peymana Lozanê.
 10/08/1920 Peymana Sêverê.
 12/08/1960 Girtina rêberên kurd endamên partiya yekemîn.
 20/08/1920 Bajarê Qamişlo bi destê Firensiyîyan hate ava kirin.
 09/09/1984 Yelmaz Gunay koçkir
 11/09/1961 Şoreşa êlûnê ya ku Berzaniyê nemir pê rabibû
 17/09/1992 Sadiq Şeref Kindî serokê P.D.K.Îran li Berlînê şehîd ket
 20/09/1992 Mûsa Enter şehîd ket
 05/10/1962 Serjimartina şovenî li parêzgeha Hisîça di derheqa kurdan de
 05/10/1992 Girtina 350 kesên kurd bi tawanbariya ku kaxet li dujî hikûmeta Sûrîyê li dîwaran xistibûn
 07/10/1988 Nûredîn Zaza yekem serokê partiya kurd li Sûrîyê li Cinêvê koçkir.
 10/10/1991 Ebdilhemîd Zîbarî şehîd ket
 11/10/1993 Apo Osman Sebrî koçkir
 22/10/1984 Cigerxwîn koçkir
 22/10/..... Roja helbesta kurd li kurdistana rojava.
 30/10/1985 Qenatê Kurdo koçkir
 03/11/1997 Kemal Ehmed Derwîş (sikreterê partî) û Şêxmûs Yûsif Şêxmûs şehîd ketin .
 09/11/1995 Leyla Zana xelata " Sakarov" girt.
 11/11/1918 kovara Jîn li Istenbolê destpêkir
 13/11/1960 Şewata Sînema Amûdê
 10/12/1948 Daxuyaniya cîhanî ya Mafê mirovan
 13/12/1981 Kuştara Cîrnîkê li Qamişlo, 15 şehîd û 3 brîndar
 17/12/1946 Dagîr kirina komara Mihabad û girtina Qadî Mihemed



Ferhad Îçmo Xelata Cigerxwîn a Afirandina helbestê wergirt



Komîta Xelata Cigerxwîn a ji bo afirandina helbestê ji bo sala 2013an biryar da ku xelata îsal diyarî helbestvanê kurd Ferhad Îçmo bike, ji ber taybetmendîya wî di veguhestina helbestê de, û ji ber ku bi dehên salan e ku xizmeta helbesta kurdî dike, û dengê resen û bilind e di cîhana helbesta kurdî de.



Xelata Cigerxwîn a ku sala 2001ê destpê kiribû, yek ji xelatên ku Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî salê dide helbestvanekî, û ta ana daye van helbestvanan: Seydayê Keleş, Bêbuhar, Mela Nûrî Hesarî, Mihemed Elî Hiso û Xelîl Mihemed Elî Yûnis.

Komîta xelata Cigerxwîn dê ji bo pêşkêşkirina xelatê boyî helbestvan Ferhad Îçmo şahiyek taybet li dar bixe.

Katjimêr 11.00 ji sibeha 15/11/2013an li mala helbestvanê nemir Cigerxwîn li Qamişlo-taxa Xerbî, çimkî wek her car xelat li wir tê pêşkêş kirin.

Malbata xelatê:

Ebdilsemed Mehmûd - Şehnaz Şêxê - Ehmed Heyder

Ji bo tîkiliyan:

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî

Ahenga xelatkirina helbestvan Ferhad Içmo bi xelata Seydayê Cegerxwîn

Bi vexwendinekê ji Hevbendiyê Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê di nav çarçewa çalakîyên wêyî ji bo çalakirina çandê Kurdî, roja Înê di 15/11/2013 de heskiriye helbesta Kurdî û gotina resen li mala helbestvanê paye bilind Cegerxwîn kombûn da beşdarî ve karnevalê bibin.

Karneval bi xulekeke bê deng li ser canê pakrewanên Kurd û yê şoreşa Sûriyê dest pê kir, paşve helbestvana navdêr Narîn Metînî binavê Hevbendiyê Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê bixêrhatina hemû mihvanan ji siyasetmedar, rewşenbîr, civaknas, hunermend, rêxistinên mirovan û yê jinê yê ku li ser vexwendina Hevbendiyê amadebûn kir, da paşve rê bide nivîskar Ebdilsemed Dawûd, wîjî di gotina xwe de li ser rengî û zengîniya helbestê û rola wê di kûrahiya derûniya mirovan de şrove kir.

Mistefa Ebdilezîz hin ji helbestên Cegerxwîn yê li ser evîndariyê û bedewiyê diaxivin xwendin .

Mamoste Xoşnav Mûsa di gotina xwede li ser aliyê niştimanî di helbesta Seydayê Cegerxwîn de şrove kir . Salih Silo bavê Mislih yê ku helbestên Seydayê Cegerxwîn ezberkirin e hin parçe ji wan helbestan xwendin. Herweha Keça Partîzan helbesteke netewî ji helbestên Seydayê Cegerxwîn ji amadebûyan re xwend .

Helbestvanê xwediyê dengê bi coş Dilbirîn helbestek bi vê helkeftê li ser giringiya cihê helbesta Seydayê Cegerxwîn di dilê Gelê Kurd de xwend . Gotina Hevbendiyê Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê û gotina komîta serperîştîya xelata Cegerxwîn li ser navê Su'ad Cegerxwîn, helbestvan Ebdilsemed Bavê Helbest xwend, û tede li ser giringiya vê xelatê dinav rewşenbîrên Kurd li Sûriyê de hat tekez kirin.

Herweha navên ku xelata Cegerxwîn berya nuha bidest xistine anîn ziman wekû Seydayê Keleş, Mela Nûrî Hesarî, Xelîl Mihemed Elî Yûnis, û Mihemed Elî Hiso. Su'ad Cegerxwîn kêfxweşiya xwe bi vê helkevte derbirî, û spasiya komîteyê li ser hîlbijartina wan ji helbestvanê hêja Ferhad Içmo re kir, ji ber ew kesekî navdare di warê Helbesta Kurdî de. Paşve helbestvan Ebdela Gedo bikurtî li ser jiyana helbestvan Ferhad Içmo 'xwediyê xelata vê salê' û berhemên wî yê çapkirî, û xelatên ku wî wegirtine herweha helbestê wî yê hunermendên navdêr strandine axivî.

Helbestvan Ebdilsemed Mehmûd doz li helbestvan Dilbirîn kir da xelata Cegerxwîn radesî Ferhad Içmo bike, Ferhad Içmo kêfxweşiya xwe bi vê xelatê derbirî, û xelata xwe diyarî penaberên kongeha Domîz kir, û bi helbesta Ferhad Içmo "Agir li vire Agir li wire" aheng hat bidawî kirin.

Nivîsgeha ragihandinê ya xelata Cegerxwîn ya helbestê .

xelatacigerxwin@gmail.com



Bîranîna 53an a şewata Sînema Şehrezad li Amûdê

Li mîrgeha Şarîqa ya li Îmarata Erebi û bi vexwendinekê ji kurê bajarê Amûdê rojnamevan Ebdela Mîzer ahengek bi helkefta bîranîna 53an a şewata Sînema Şehrezad li Amûdê, û koçkirina nivîskarê Kurd Hesen Dirêî, li otêla Karilton hat li darxistin.

Di ahengê de gelek nivîskar, rewşenbîr û hin ji endamên revenda Kurd amadebûn, herweha balyozê giştî yê komara Cezairê, Dr. Ebdilbasit Seyda, Ebdilehed Stêfo Dr. Mihemed Hebeş û derhînerê Sûrî yê cîhanî Welîd Quwetlî ji amadebûyan bûn.

Rojnamevan Ebdela Mîzer pêşkêşvaniya ahengê kir, û helbest, stran û gotin ji aliyê nivîskar Ibrahim El-Yûsiv, şewekar Welîd Tewfîq, nivîskarê Ceza'irî Mihemed Hisên Telbî, romankar û rojnamevanê Ceza'irî Ebdilrezaq Bûkîbê, romankarê Felestînî Mihemed Muhîb Cebir,

Rojnamevanê Felestînî Mihemed Nebîl Sebretlî, Dr. Ebdilbasit Seyda, Nivîskar Xorşîd Şûzî, nivîskar Welîd Ebdilqadir û Cemîl Darê, Eman El-Seyid, Lema El-Leham, Fedwa Kêlanî, Mihemed Idrîs, Ronîcan Hiso û Emced Irar.

Herweha nivîskar û rojnamevan Xorşîd Şûzî gotinek li ser navê Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê xwend .



Karnevala Gelawêj ya hivdehan li Silêmaniyê

Li bajarê Silêmaniyê çalakiyên karnevala Gelawêj ya hivdehan bi amadebûna cemawerekî zor, û hazirbûna Hîro xan hevîna serokê Îraqê Celal Talebanî û berpirsyarê giştî yê karnevalê Mela Bextyar li hola kongireyan li otêla Silêmanî Palas bidawî hatin.

Mela Bextyar bixêrhatina mihvanan kir, û li ser giringiya vê karnevalê di hevdiîna ku nabvbera rewşenbîrên Kurd de çêdike axivî, herweha Mela Bextyar helbestvanê kurd ê paye bilind Şêrgo Bêkes bibîranî û li ser rexnekirina çak ji bo bipêşxistina civakê bi hemû rengan tekez kir.

Li dawiya axiftina xwe Mela Bextyar spasiya hemû amadebûyan kir, paşve xelat li gelek nivîskaran hatin belav kirin, û nivîskarên Kurd û endamên Hevbenda Nivîskar û Rojnamevaniyên Kurd li Sûriyê Ibrahim mehmûd û Hoşeng Osê jî hatin xelat kirin.



BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ

KURD DI ÇAVÊ DUNYAYÊ DE



Beşa yekemîn:

Baş hatîye gotinê “dar li ser koka xwe hêşîn dibin, mirov li ser zimanê xwe”.....

Xwedî û bankerê nîrxên mirovahîyêye tewrebilind ê cihanê kurd têne hesabandin.

NETEWÊK EFSANEWÎYE.

BI CESARET mirov dikare êtîraf bike ku gelê kurd netewek ji bîrnekirî û ne veşartîşye, dîrokîye

Dîrokêda tu tişt veşartî namîne, dîrok sêra xayî nake . Dîrok hertim zindî û hişyare .

KURD RÊWÎYÊ DÎROKÊ, EVÎNDAR Û NIRXANDARÊ HEQÎQETÊNE

Gellek dîroknas, nivîskar, ruhulatzan, gerok, sîyasetmedar, kesayetên dîrokî di derbarê netewa kurdada fikir û ramanên giranbuha anîne ziman . Mirov bê şik û bi cesaret dikare bêje ku analoga netewa kurd tunene, dereqa tu cîvak û netewanda hawqas gotinên balkêş, giranbuha û xaş nehatine gotin.

Xwendevanên hêja û bi rêz,,di vê gotarêda hinek ji van gotinan ên bijare bi baristanî ên ku hatine berav kirinê dîyarî we dikim, ji bo ku xwe nasbikin û binirxînin balkêşîyek van gotinan heye, hêjayî firmax bûnê û şanaz bûnêye...

Ji bo ku yekbûna xwe ava nekiriye gelê kurd demeke dirêje negêhiştîye armanç û daxwaza xwe hêja û pîroz .

Gel çiqasî tê xapandinê hawqasî bi çûk û zeif xuya dibe. Netewa kurd bi deman hatîye xapandinê

Kurda hertim bê temene alîkarîya mirovan kirine, alîkarin ji xwe ra peywir hesabandine. Yê ji xwe zeiftir tu wext pêpez nekirine . Kurd bi sîdqê xwe tewrebilindva naşipin yê din .

Ruhê kurdada hukmê azadîyê gur û pire.

Bi xwedava bi bawerî û hêvîke mezin ve girêdayîye Kevneşopî cîvaka kurd ji dema hemdemî qut dike.Tayfetî kurda ji xwera kirine kar û pêşe, bûye bela serê kurda. Bê fehmî, nezaneî cîvaka ji pêşketinan dûr dixê.

Kurd efrandarê edaleta dîrokê a gerdûnîne .

MÊRXASÊ DÎROKÎNE

„Çi dem ku ez hînbûm dîrokên kevnar,

Min biryar da soz vekim ji gelê navdar .

Buhurya vî gelî bi şeref heye,

Ev şeref îro jî dîrokê daye.

Têgîhanên mezin çî dem ku rabûn ,

Esnafê dunyayê kurda re şabûn...

Ji bo azadîyê gellek qurban da,

Ev gel tê bîrkin nizanim çima ,,

SEBAHEDDÎN ÊLOXLÛ şaîr-filosof, AZERBAIJAN

“Gelleka re yê usa bê xuya kirin ku azadîhizya gelê kurd bi rewşa wî a cîvakî, sîyasîva girêdayîye. Lê evîn û eşqa azadîhesîyê di ruhê her kurdîdaye.Nolî mexrûrîya wî bi îrsîye (dolîye) .” CÊYMS OLDRÎC, nivîskarê îngîlîz ê navdar.

VÊYDÊNBAÛM nivîsîye..” KURD JI HÊNÊ KEVNARDA NAVDARIN,ÇAWA BINELÎYÊN MÎDÎYAYÊ --- KURDISTANA HEMDEMÎ“

“...Rengekî arîyaye bi cesûr Mîdyayî li bilindîya çîyayên berz li ber dergê Kafkazê dijîn. Bi artêşek bi sehm,bi rext, rimê birqonekîva navdarin “Êsxîl .Fîlosofê dema antîk.

“Belkî jî ez Kurdistanê Azad nebînim,lê zarokên min yê ese bivînin Kurdistanê serbixwe. Hun layîqî,hêjayî dewleteke taybetin., hun gelekî, ranewestî,pêşeroj ya weye.” Nêlson Mandêla (JI xelata dewleta Turkyayê ye tewrebilind a li ser navê Ataturk înkare dike) .

“Qêyreta kurd jê bistîni tu tiştê wî namîne.” yek jî “Dîrokêda tu dem tu kesî bi çîyayên berz li ber dergê Kafkazê dijîn. Bi artêşek bi sehm,bi rext, rimê birqonekîva navdarin “Êsxîl .Fîlosofê dema antîk.

“Belkî jî ez Kurdistanê Azad nebînim,lê zarokên min yê ese bivînin Kurdistanê serbixwe. Hun layîqî,hêjayî dewleteke taybetin., hun gelekî, ranewestî,pêşeroj ya weye.” Nêlson Mandêla (JI xelata dewleta Turkyayê ye tewrebilind a li ser navê Ataturk înkare dike) .

“Qêyreta kurd jê bistîni tu tiştê wî namîne.” yek jî “Dîrokêda tu dem tu kesî bi

tenha sere xwe bi kurda nikarbûye “Rojname TAYMIS 18. 07.1921 . Angilya

“KURDISTAN şûrekî mezine” Ataturk “Kurd risarê rojhilatêne” X. ABOVYAN nîvsarkarê navdar ê ermenî. “Her jineke kurd mêrxas û helbestvane “ X.ABOVYAN . “Kurd zir ewladê dîrokêne “ Lîngvîst, kavkaznas, kurdnas, ruhulatzan, akadêmîk N. YA. MARR .

“Kurd miletekî şen - şox, natîg, aqil û poêtîke .

Bi gilîkîve netewekî mustesnaye (bê ezeze)”

A.VASÎLYEV, RUHULATZAN

“Kurd ji mirinê jî natirse”. KSÊNOFONT filozofekî antîk

“Gelê kurd mêrxas û merde” H. ELÎYEV prêzîdêntê Azerbaycanê , sîyasetmedar ê navdar.

“Kurd miletekî bi sîyanet û xwedanê sozê xweye.,dilsoze. Wekî kurdekî ji tera gilî da ku te sax û silamet bigîhîne êwirê dikarî rehet bawerîya xwe lê bîni.”Gerokek fransîz“Kurd bi hêz û jêhatîne, berbicav in . “V.VAYGRÊM

“Heya naha pir cara gelê kurd hatîye xapandinê.Di pêş cavê dunyayê li hemberî gelê kurd komkujî (gênosîd) berdeyam dike.Ji bo vê em jî

berpîrsîyarî-sîyasetmedar, rêxistin, tevgerên aşîyê, dewlet bi gilîkîva em tew tawanbarin”.

H.ŞARRÊNBROÛC sîyasetmedar,Almanîya.

“Ji demên kevnar bigire ta heya roja îro gelê kurd hemû bûyerên ku li Asîya rojava qewimîne têdabûne. Gellek hukumdar û serleşkerên turkîye, Îran û ereban ên dengîn bi eslê xwe ve kurd bûne.Gelê kurd bi taybendmendîyên xwe gelêrîve netewekî newekîlan dîye. Xemiland bûna çanda cihanêda efrandarîya kurda balkêşe, roleke wan girîng heye.” M.S. LAZARYEV,KURDNAS. “Gelê kurd ê rencandî,hincirandî hewil dide di Kurdistanêke serbixweda azad bijî.Ev maf û heqê wî însanîye.” Bêrît Êrîksson.,sîyasetmedar Îsvêç.

“Kurd li dijî xwîn rijandinêye,ne ew kurde,tenê li qada şêrda ji bo ku xwe biparêze xwînê dirêjîne“T.F. ARÎSTOVA kurdnas.

“Dîroka gelê kurd di hemberî grêk, ereb, mongol, fars,turk û di dijî dagirkerên herêmî berxwedana dîrokîye.Gelê kurd ji şerên dîrokîye mezin û giran hertim bi serbilindî derketîye, çand û zimanê xwe parastîye.” T. F. ARÎSTOVA, KURDNAS.

“Gelê kurd miletekî pir milyone.Bi çand û resena xwe a newekîlandîva tek miletekî mezine kîjan ku bê dewlete. dewleta wî tunene”. ÇARLZ LÊYN., Amêrika, rojnemavan .

“Netewa kurd lawên xwe li bin nave îranî, turk, ereb, ermenî undakirîye.

Ewledên kurd dîroka van wek helbestvan, hunermend, hunermend, serleşker ên navdar xemilandine, meşhûr kirine” Î.A. ORBÊLÎ ruhulatzan

“Di şerên giranda artêşên dujmin di hemberî kurdan acîz mane,gellek undabûn dane,bi kurda nikarbûne, ji şêr îmtîna kirine, paşda vekîşyane. Kurdên azadîhes û cesûr ji bo serxwebûnê bi îsrar hertim qada berxwedanê da bûne.” EREB ŞAMÎLOV, nîvsarkarê kurd.

“ Ji netewên kevnar ên Rojhilata Navîn û Nêzînk yek jî kurdin.

Ev gel bi demên dirêjve xwedanê çandek dewlemende . Gellek abîdên arxîtêktûr û edebî ên ku hatine derketine dema me ji vê yekêra sîbûta zindîye . Dereq cesûrtîya û çalaktîya kurda dîrokvanên yûnana ên dema antîk Hêrodot û Ksênofont pesinê wan didin” M. RÛDÊNKO kurdnas.

“Ez hertim bi netewa kurd re bûme,tu wext min helwesta xwe neguherîye.Ji bo ku piştgirîya her çar parçên Kurdistanê dikim,Turkîye,Surîye û dewletên din me gellekî rexne dikin (Lîvîyê).Lê min gotîye û diweklînim ,netewa kurd li ser axa xwe dijî û mafê wî serxwebûnê heye”.. MÛAMMAR KADDAFÎ. “Ez bi dil dibêjim,ez hejmeke cesaret,biryar û hêza berxwedana gelê kurdim” HAROLD PÎNTÊR ,nîvsarkarê îngîlis.

“Çaresernekirina pîrsgirêka netewa kurd ji bo pêşketina çanda kurd derbeke mezine “ Vêra BYUDÎN SAÊDPÛR., Amêrika, zanyar.

RUHULATZAN, DÎROKNAS Ê NAVDAR M.S. LAZARYEV DEREQA KURDADA WEHA DINÎVSE.

“Gelê kurd demeke dirêje li ser axa xwe netewî dijî . Miletêk din weha dijwar yê peydabe.”

“Kurd miletekî ne kêr hejmare,miletekî bê dewlete.Welatê wî çar cî hatîye parçe kirinê. Berxwedana gelê kurd ne tevgerê sêparatîste, tevgerê rizgarîyê”

VALÊRÎYÊ DÊ POÛLPÎGÎÊT, mafnas, Fransa.

“Ji bo rizgarîyê gelê kurd berxwedanê dike. Kurd ji bo azadîyê amadane canê xwe jî qurban bidin. Vê rêçêda îrada gelê kurd ê şoreşger şikêstandin nabe.” CA VAHÎRLEL NÊHRÛ. Rêberê gel ê hînd.

“Ez bangî nivîsarkar û gelê kurd ê qehreman dikim Berxwedana ku we destpêkirîye berdewam bikin heya dawîyê herin. Ev mecbûrîyete, pêwîste”

LOÎRA MÎNGÊLÎ, nivîsarkar ê Îspanîya (bask).

“Peyva kurd bê şik tê vê weteyê - merd û qehreman. Gellek mêrxasê deman û lehengên navdar ji nav vî gelfî derketine” Şerefîxan Bîdlîsî, dîroknas .

“Ez gellekî şanazim ku miletê min kurde, kurdim . Gelê me hawqas êş û jan, rencandin dît lê pey bobelatan re ji bo tohildanê nafikire”. MESÛD BERZANÎ, SEROKÊ HERÊMA KURDISTANÊ.

BUHURTÎYA XWE KU HÎNBE MUSELMAN, HERTIM YÊ BITEWE BER DERGÊ KURDAN....SEBAHEDDÎN ÊLOXLÛ, şair-filosof, Azerbaycan., DI DILE HER KURDEKI DE KURDISTANEKE SERBIXWE HEYE., M. M. BERZANI.

„Kurd -- navê xweda ê veşartîye,kurd çawa navê dostê teye, heja laşê mirov û heja serkeftinêye,, Dênîs TÛKMANOV, rojnama Zavtra, (Rûsîya) hejmara 10 adar, 1999.

GELÊ KURD XWEDAN ZÊHNÎYYETEK ZELAL, MENEWÎY YETEK DEWLEMEND Û PAQIJE

EM KÎNE

Em kurdin.

Mêrxasê deman.,

Rêberê gelan,

Kurd tîn ji qurnan,

Ji qadê giran,

Jîn bi serhildan,

EMIN BERXWEDAN.... Dû MAYİK HEYE.....



Alan Pîr Mem

Xwedê giravî...

Cinêv jî çareserkirine



Ne cinêv hat , û ne civaka nêvdewletî hat, û ne bi me ve hatin , em hiştin bi xwe, bi birîna xwe , bi kuştîyên xwe ve girêdayî ,dîl, me ne ji xwe re tiştêk jê têgihîşt , û me ne ji xwe re tiştêk jê da hev, hema her kuştin, û her talan , û her êş û derd û bobelat û azare.

xwedê giravî dibê wê cinêv jî masa çareserkirîne be ,wê rejîma desthilatdar bi serokatîya qiralê sed saliya bîst û yekê "Beşar Esed" û oposîsyona sûrî wê li hev rûnên bi hazîrya welatên mezin wekû emêrika û rûsya û birîtanya û firansa û welatne erebî û ewrupînî dîtir, lê me ji xwe re tenegehîşt , hatna herdwa jî bi merce , ji alîkî ve dengêk ji şamê bilind dibe û dibê em nayên cinêverê ji bo ko em desthilatdariyê bidin we , û gi em hatin (gi...ha) divê kes basa serokatîyê meke , û kes nêzîkî vê babetê giş jî mebe, û ji xwe ji alîkî din de , hin li îstembûlê , hin li dewha , hin nîzanim li kur evê ko nav li xwe kirne oposîsyon , dibêjin em jî nayê cinêverê ko îran lê hazîr be û gi em bîn jî divê ti rol ji "Beşar Esed" re di pêşeroja sûrî de tine be...û ji xwe divête qiralê menî tazî dev ji serokatîyê berde berî her tiştî .

îca me safî kir, evê dibê ezê werim lê bi merc, û yê din jî dibê ezê werim lê bi merc.

hewyê hev û îca ka wê çawa li hev rûnên û wê guftûgoyan li gel hev bikin .

na yabo...ne ev çareserkirîne dixwazin , û ne ev çareserkirîne dixwazin , oposîsyon ev du...sê salê wan barrebarra wane dibê : xelk tene kuştin, xelk talan dibin, beşar bi firokên mîg li wan dixê, bi tang û topan wan bumbebaran dike, wan bi çekên herî qedexê li ser riwê cîhanê bi kîmawî wan bin ax dike.

heft milyon mişext û penaber, du milyon sûrî ji derveyî welêt bê çawa dabeş û belav bûne li ser pênc...şeş welatên hawîrdor, û çar milyon li hindir gi ji ber bumbe barankirîne û birçîbûn û dorpeçkirin û nexwşyê revyane.....û hwd.

başê "Beşar Esed" dîktatore ..hitlerîkî basiyemosolînekî nûjene ...xelk bi hezaran koçber kirin ..ji serê ssedî şêst ji welat wêran kir ...li şam û hums û hema û heleb û dêrê û reqa kevir li ser kevir nehişt...hemû cûrên çekan bi karanîn di kuştina sivîl û zarok û ciwan û pîrejî û kalemêra de .

lê madam win jî xwe dibînin xwedî û berpirsyarê vî milletî , û win bang li hemû rêxistin û sazîyên sivîl dikin, de bi hawara vî milletî ve werin, û nîza bê ev çend salê weye ko win li derveyî welêtin, û madam win wilo bi kovanî û bobelat û nalîna vî milletî hest dibin, ka win çima ne nermin bi rejîmê re , û ka win çima xwe ji alyê din re danaxin , ne ji bo tiştêkî, lê hema belkî ev agir vemre û ev xwîn raweste , û xelk ber xwe bibînin ,li mal û samanên xwe vegezin.

ka win çima li hev hatin û çareserkirîna nagerin, û win bi hevrikiyên xwe ve daketîne, win ji mêwanxaneyekê diçin mêwanxaneyekê, û hema win li ser van telefîzyona derdikevin .

bi bedil û gerefêt...na...na eyn winin gîvarê şoreşa sûrî, winin mandêla û lînî û kastro û hoşimîne wê .

ma qey we tiştêkî wê û şoreşê di nav hev de hişt.

wey xwelî li serê me be ko win îro ro bûne xwedî me , ko hin ne wekû we bûne nûnerê me di nav civaka nêvdewletî de.

eve cinêv, ev delalyê xwe dike, dibê ez nayên cinêvê ko mercên me bi cî neyên , û ev delalyê xwe dike û dibê em jî nayên ,gi ne bi merc be.

ev ne yê çareserkirîne, em herdwa jî şermezar dikin di xwîna vî milletî de , û ne cinêva didwa û ne cinêva deha .

Amadekirin: Ezîz Xemcivîn



Bingehên gramera kurdmançî

Celadet Alî Bedirxan

Bi navê Yezdanê pak ê dilovan ê mihrevan
TEWANG

52- Zimanê kurdmançî zimanekî **tewangbar** e. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe namînin û li gora cihê ko di qisetê de dikevin ê, û wezîfa ko li ser xwe digirin tene **tewandin** û hin parkît bi wan ve dibin, an hin tîpên wan bi tîpine din diguhêrin.

53- Ji birên qisetê bi tenê ên **guhêrbar** tene **tewandin**. Ên **neguhêrbar** tu caran nayine **tewandin** û ew hergav weke xwe dimînin.

54- Bi gelemperî bêje di qisetê de an **kirar** an **bireser** in. Gava ew **kirar** in weke xwe dimînin û gava dibin **bireser** hingê tene **tewandin**.

Tewanga her birê qisetê herçend yekcar ji hev cida nebin jî ew kêr û zêde ji hev biferq in. **Tewanga** her birî di cih de û di devera wê de dê bête gotin.

55- **Tewanga navdêran**: Navdêr, **hevenav** bin **sernav** bin, li gora **mêjer** û **zayendên** xwe tene **tewandin**. Bi gelemperî û di yekejmariyê de **navdêrên nêr** bi "î" yê û **navdêrên mê** bi "ê" yê û **gelejmar** herdiwan bi "an" ê tene **tewandin**. Ev **parkît** bi paşîya **navdêran** ve dibin .

Hesp hat Hesp hatin

Mehîn hat Mehîn hatin

Di komekên jorîn de **navdêrên "hesp"** û **"mehîn"** ne hatine **tewandin**. Ji ber ko ew her du jî di wan komekan de **kirar** in û **kirar** nayine **tewandin**. Lê ev **navdêr** bi xwe di komekên jêrîn de hatine **tewandin**. Ji ber ko tê de êdî ne **kirar** lê **bireser** in.

Ez hespî dibînim. Ez hespan dibînim.

Ez mehîne dibînim. Ez mehînan dibînim.

Di mîsalên jorîn de **navdêr** hemî **bireserê lêkerê** ne. Lê **navdêr bireserê navdêreke** din jî dibin. Hingê jî **navdêr** tene **tewandin**. Herwekî: **Ev goştê çêlekê ye. Ava golê şêrîn e. Di çiyayên kurdistanê de her texlît dehbe û cenawir hene. Gola Wanê goleke spehî ye.**

Şanek: Di nav bêjeyên ko bi "an" ekê tamam dibin, di hinan de ev "an" ji esil û rayekê bêjeyê ye. Mîna: **Rewan, baran, peyman, garan, kevan, diran** h.d. Lê di hinên din de ev "an" bi xwe, **tewang** e, û ji ber sebebê bi wan ve bûye. Mîna: **Serhedan, Botan, Şêrwan, Xerzan, Hevêrkan** h.d. Ji lewre ev bêjeyên ha bi tu awayî nikarin bêne **tewandin**.

Ji ber vê yekê herwekî mirov dibêje "Ez ji **Rewanê tîm**" nikare bibêje "Ez ji **Botanê tîm**" Ji ber ko esilê bêjeyê "bot"e, "an" ko pê ve bûye **tewanga gelejmarê** ye. Ji xwe gava em **Botan** dibêjin mexsed "cihê" an "eşîra Botan"e. Bêjeya "bot" **bireserê** cih û eşîrê ye û ji lewre hatiye **tewandin** û bûye "Botan". Mîna bêjeya "dar" gava dibe **bireserê** bêjeke din tene **tewandin**. Herwekî: **tewandin**. Herwekî: "pelên daran". Bêjeyên wek **Serhedan, Şêrwan, Xerzan, Hevêrkan, Soran** jî mîna wê ne û tev de

de yek hawî ne.

Di vê navê de bêjeya "gulan" rexma ko ji vî cinsî ye tene **tewandin**. Bi rasî esilê vê bêjeyê "meha gul, meha gulan" e; yanî "an" **tewang** e. Ji lewre diviya bû "gulan" ne hata **tewandin**. Lê ev bêje ji qeydê der û bi **awarteyî** careke din tene **tewandin** û dibe "gulanê" û li şûna ko bibêjin "meha gulan" dibêjin "meha gulanê". Ji ber vê yekê "an" a gulanê divê ji esilê bêjeyê bête hesabandin .

56- **Awarte**: Bi tenê û ji qeydê der di **lêkerên gerguhêz** û di zemanê wan ên borî de **bireserên** wan weke xwe dimînin û ji berevajî ve **kirarên** wan tene **tewandin**. Ji lewre, di komekên jêrîn de rexma ko bêjeyên: "Zîn, hesp, çêlek, zarok" **kirar** in, hatine **tewandin** û bêjeyên: "Sîsin, ceh, pencere" yên ko **bireser** in weke xwe mane û ne hatine **tewandin**.

Zîne Sîsin dît. Hespan ceh xwar . Çêlekan giha xwari bû . Zarokan pencere şikênand

//////57- Herçî **navdêrên nêr** in heke di wan tîpên "e" û "a" hene ev **navdêr** dikarin bi guhartina wan tîpan bi "ê" kê jî bêne **tewandin**. Herwekî di wan komekên jêrîn de: "Soro ji kêvir ket. Gurgîn çû eş. Balafir ber bi ezmên firî . Ez li hêsp siwar bûm. Ferzo ji bajêr têt. Kî li ser bîn bû? Em ji xênî derketin" Bi vê qeydê ve, divê di qisetê de hin **navdêrên nêr** bê **tewang** bimînin. Ji ber ko di hemî **navdêrên nêr** de dengdêrên "e" û "a" peyda nabin. Ji lewre û li nik kurdmançên ko bi vê qeydê ve diçin bêjeyên wek: "kum, goşt, dil, hiş, mirov, mêrik, gir, kur, mîr, mêr, gund" nayine **tewandin**, ji ber ko di wan de ne "e" ne jî "a" heye. Ji ber vê yekê gava ew di qisetê de dibin **bireser** jî weke xwe dimînin. Pişî ko ev qeyda di zimên cih bûye **navdêrên** bi "e" û "a" jî di qisetê de bê **tewang** hatine gotin. Ji lewre herwekî mirov dikare bibêje "ez ji kevirî-an-kêvir ketim" dikare bibêje jî "ez ji kevir ketim" û bêjeya "kevir" netewîne.

Şanek: Ji raveka jêrîn dixuye ko di **navdêrên nêr** de meyildariya zimên ber bi terikandina **tewanga** wan a **yekejmar** e: nemaze şiklê pêşîn. Ji lewre her sê şiklên jêrîn rast in .

Soro kevirî tavêje . Soro kêvir tavêje . Soro kevir tavêje . Gurgîn çû aşî . Gurgîn çû eş. Gurgîn çû aş.

Balafir ber bi ezmanî firî . Balafir ber bi ezmên firî . Balafir ber bi ezman firî .

Ez li hespî siwar bûm . Ez li hêsp siwar bûm . Ez li hesp siwar bûm . Ferzo ji bajarî têt . Ferzo ji bajêr têt. Ferzo ji bajar têt.

Kî li ser banî bû? Kî li ser bîn bû ? Kî li ser ban bû ? Em ji xaniyî derketin. Em ji xênî derketin. Em ji xanî derketin.

58- Gava çend **navdêr** didin pey hev herwekî mirov dikare wan **navdêran** li gora **mêjer** û **zayendê** heryekê yek bi yek **bitewîne**, dikare bi

tewandina hinekan jî bes bike.

Navdêrên ko dane pey hev ne ji yek **zayendî** ne; lê tev de ji yek **mêjerî** ne. **Tewandina navdêra** paşîn bes e. "Ez hesp û mehîne dibînim. Ez hesp û mehînan dibînim. Hesp û mehînan xwar".

Navdêrên ko dane pey hev ji yek **mêjerî** û tev de **yekejmar** in, lê ewne ji yek **zayendî** ne;

û **navdêra paşîn** nêr e. Ji ber ko di **tewangê** de esil **navdêra paşîn** e û hikim li **mêjerê** wê ye heke ew ne hatiye **tewandin**, **navdêra mê** jî bê **tewang** dimîne. "Ezê herim keçik û kurik bibînim. Tu Rewşen û Felemêz dibîn?"

Şanek 1: Herçî **navdêran** ko bi "e" an bi "a" yê tamam dibin, çî **mê** çî **nêr**, ji ber kurtiyê, di **yekejmarê** de bi guhartina wan tîpan bi "ê" kê jî tene **tewandin**. Di **gelejmarê** de ew "e" û "a" yekcar dikevin û "a" ya **tewangê** dikeve şûna wan.

Li ser maseyê

Li ser masê

Li ser maseyan

Li ser masan

Ber bi çiyayî

Ber bi çiyê

Ber bi çiyayan

Ber bi çiyân

Çirayê vemirîne

Çirê vemirîne

Perdeyê rake

Perdê rake

Perdeyan rake

Perdan rake

Şanek 2: Bêjeyên weke **Frense, Sûriye, Emêrika, Efrîqe** h. d. yên ko bi "e" kê tamam dibin, heke ew bi guhartina wê "e" yê bi "ê" kê ne hatine **tewandin** û ketine bin hikmê qeyda gelemper ew "e" bi "a" kê diguhêre û ew bêje bi awayê jêrîn tene **tewandin**: "ji Sûriyayê, ji Frensayê, ji Emêrikayê, ji Efrîqayê".

Lê şiklê din, yanî şiklê: **ji Frensê, ji Sûriyê, ji Emêrikê, ji Efrîqê** siviştir e .

59- **Bireserê navdêrê**: **Navdêr** di komekê de an bi tena xwe ne, an bêjeyêke din bi wan ve bûye û hevaltîya wan dike. Ji wê bêjeyê re **bireser** dibêjin; ji ber ko ew mana **navdêrê** diedilîne û dibe serî.

Bireserên navdêran, li gora cinsên xwe li pêşî an li paşîya **navdêran** tîpên zêde kirin.

Bireser gava dikevin pêşîya **navdêran** bêyî tu tiştî bi wan vedibin: **ev keçik, kîjan mirov, çar xanî, hin çiya, çend kitêb, deh bizin, van zarokan.**

Lê gava **navdêr** bi xwe li pêş e û **bireser** dane pey, hingê **veqetandek** dikeve navbera **navdêr** û **bireser** û wan digihîne hev: **Beriya Mêrdînê, hespê beza, mehîna spehî, çiyayê bilind, pehna çiyê, newala kûr, rêke dirêj, stûna xênî, destê bi tenê, dara şikestî, xencera min.**

60- **Navdêrek** dikare çend **bireseran** bibe. Hin ji wan dikarin bikevin pêşî hinên din jî paşîya **navdêrê**.

Bireserên ko ketine pêşîya **navdêrê** û yên ko dane pey wê ji alîkî û tev de **bireserên navdêrê** ne û ji aliyê din ew bi xwe **bireserên** hev in: **Min çend kitêbên qenc hene. Ev xencera min e. Ev xencera xulamê min e. Ev xencera xulamê cîranê pismamê min e.**

Ebdulbaqî Huseynî

Ji ferhenga jinên kurd (xeleka 5)

Xanzade xatûna Soran

Hozan û tîkoşera kurd

a ku taca mayîne li ser serê xwe hişt



Xanzad yek ji jinên kurd e, ku şûneke pir mezin bi dû xwe ve hiştiye, navê wê di dîroka kurdî pir belûye, lê mixabin jêderên ku li ser jiyana wê hatine dîtin gelekî kêmin, û ta roja îro tu kesî lêkolîn li ser jîneriya wê çenekirine, ji bilî hin caran û bi çend xêzikan pepûk li ser wê hatiye nivîsandin.

Di vê xelkê de, ezê hewl bidim ku xwendevanên zimanê kurdî, zaravê kurmanjî, û ên ku bi tîpên latînî dixwînin, ku hinekî li ser jiyana Xanzad xatûna Soran nasbikim, û hemî jêderên di nav destên xwe de, wergerînim zaravê kurmanjî.

Xanzad keça Hesên Bege ye, di çerxa (qirne) dehan û yanzdan ê koçberî jiyana dibû, wekû mējûnûsê navdar kurd Mihemed Emîn Zekî Beg li pertûka xwe (Navdêrên Kurd) dibêje; ku Xanzad jina Mîr Silêmanê kurê Şikêlî begê Mîrê Soran bû (999- qemerî). Li vir hin dibêjin ku Silêman begê birayê Xanzad e, lê piraniya jêderên di nav destên min de dibêjin ku jina wî bû.

Xanzad jinek bi tedbîr û ceger bû, rêza wê gelek hebû, digotin pir bi dilsoz û siwarceleng bû. Di rengê zilaman de rext û tivinga xwe davêt ser milê xwe û dida pêşiya çekdaran. Piştî ku Silêman begê Mîrê Soran ji aliyê hikûmeta Bexdê tê girtin, di zindanê de derman vedixwe û dimre. Xanzade karûbarên Mîrneşîna Soran dixwe bin destê xwe û bi zanayî û şarezayî karûbarê Mîrneşîne li bajarê Herîrî bi rê ve dibe.

Xanzad bi hemû hêza xwe xizmeta Mîrneşîna Soran dike, parstina wê bi xwe dike, tucarî alîkarî ji Împeratoriya Osmanî nedisten, û ta bi roja dawî

ji ferdariya wê jî, Mîrneşîna Soran serbixwe bû.

Li ser dema Xanzad gelek mizgeft û Qele û dibistan û pîr hatibûn duristkirin, welat li ser dema wê pêşdiket û bi alî şaristaniyê ve diçû .

Qeleyek bi navê xwe avekir ku ta roja îro bi navê wê ye (Qela Xanzad e) a ku bi 22 km dûrî Hewlêrê ye . û wê dorpêçdike, û li ser rîya Pîrman li gundê Banaman ye.

Qela Xanzad tê hesêb yek ji qelehên dîrokî ên girîng di Kurdistanê de .

Dibêjin Xanzad gelek caran , cilûbergê zilaman li xwe dikir û bi çend mirovên xuyayî li nava bajêr digeriyan, û li rewşa hejaran (feqîran) dipirsîn, û alîkariya wan dikirin.

Xanzade digel ku dihate nasîn ku jineke pir bi ceger bû, wilo jî aqilmend bû, û bi gelek zimanan dizanî .

Digotin ku Xanzade gelekî hez ji tore û çanda kurdî dikir, loma gelek hozan li dora xwe dicivandin, û gelek caran şevên toreyî bi hev re derbas dikirin. Ewan hozanvanan jî bi merdî helbestên xwe davêtin ser Xanzad û karû barên wê ên li Mîrneşîna Soran berbiçav bûn .

Dibêjin ku carekê Xanzad bang li Melayê Herîrî dike û nameyekê bo serokleşkerê xwe pê dide nivîsandin; û tede wiha dibêje:

”Herîr û sopay Soran bi bê tû şepreze ye

û mîrayeta Soran bi min nakrê,

xot şiyawî ew menzele ye,

Boye dawat lêdekem

Be zûterîn kat legel geyştenî em nameyem

berew Herîr berêbkewe û xozgey rabirdûşt cêbecêdekem,

ta êstaiş letûm şiyawtir nedozytewe bibête hawserim”.

Çend malik ji hozanekê hene, dibêjin ku Xanzad li ser serokleşkerê xwe gotiye:

” Ewe xozgehîm cêbecê kirdî, belam leber xelkê Herîr şoreye, çonke herwekû xot dezanî ta êstayîş tazyedarim, her emşewem rêga bide, beyanî legel destê xoşkanim deçime germaw û cilê reşim firê dedem, şew dadê dekeîne cejin û agirî dilît bikujînewe....!”.

Hikmê Xanzad li mîrneşîna Soran dora heft salan domkir, dibêjin ku dema wê, demek zêrîn bû, û tîjî dan û şaristanî bû.

Ta roja îro li sînorên Mîrneşîna Soran çend cîmawên karûbarên meznahîya Xanzade li şûnwaran

maye.


Mirovên Kurdistanê û bitaybet hunermend, xwestin ku jiyana Xanzad vejînin, rabûn gelek karên hunerî di derheqê wê de duristkirin .

Şanogeriyeke li ser jiyana wê di sala 1980 li ser televizyona Kerkûk hate weşandin .

Û vê dawiyê filmek li ser dîroka wê li bajarê Sulimaniyê hate pêkanîn ku bi navê “ Xanzad Mîra Soran” ji aliyê girûpa hunermendî a Sulêmaniyê ve.

Jêder:

1. Tarîxa navdarên kurd (Jin der tûlî tarxî) farsî.
2. Nawdarên kurd: Mihemed Emîn Zekî Begê.
3. Gotara Rênas Newrozî di malpera Dimane de, sala 2004.



Kela Xanzad li Hewlêr

Dr. Ehmed Xelîl**Kesayetiya kurdî Lêkolînên civaknasîn**

Xelex - 10

Giyanê cengwerî yê kesayetiya Kurd**Wergêr: Heyder Omer****Entilcênsiya û Xwedayan:**

Di pêşgotina pirtûka (Sinçên pirotantî û giyana sermiyanî) de, ya ramanbîrî Elman Max weber (Maks Vêber), Anthony Giddens (Antonî Gîdenz) gotiye " Maks wek ramanbîr lêkolîna xwe nivisandîye, ne wek dozdarê ol". Ez jî hêvîdar im, ku ji rêbaza Maks ve nêzîk bim, û ji rêbaza ku dibêje " Ji nîskê dike gîsk, an jî mîşê dike gamêş" bi dût de bikevim. Ez weha dibêjim, ji ber ku heye xwenerê vê lêkolînê xwe li hember bêtara lihevnekirina sernavê (giyana cengwerî ya kesayetiya Kurd) û realîteya gelê Kurd bibîne .

Ez baş bîr tînim, ku min biryar girtibû, ku nemaze di çarçewa (kesayetiya Kurd) ezê bê mêldarî binivîsînim, û ez wê biryarê, ne nûka û ne jî li duwarojê, bi paş piştî xwe de navêjim.

Ji hêla lihevnekirina sernavî û realîteya Kurd de, dibêim ev ne xaleke yekta ye, belê hinekên din hene, heye ku ji vê girantir û bêtartin bin. Lê beriya ku dest bi vê babetê dikin, hêvîdar im em van xalên jêrî ji bîra nekin:

1. Ecology (Êkologî) ji bo pêkhanîna dûmenên kesayetiya Kurd ne humayê yekta ye, belê ew yekek ji piran e, heye yek ji wan humayan ji yê din bandortir be, û hey jî ji yê din jartir be, ji ber ku pîrsa dûmanên kesayetiyê, berî pêşî, pîrsa rêjeyan e, pîre jî humayên taybetmendiyên reh (Gen), çand û rûbirûtîyê (nakokî) jî ji bo pêkhanîna wan dûmenan hevpar in.

2. Çand (culture) tevî ku yekek e ji pêkhatên kesayetiyê, li di heman demê de ji humayên din bêtir kesayetiyê diderbirîne, kesayetî bi wê numa dibe û tê naskirin. Rast e, ku çand ji koka xwe de encama tevlihevûn û lihevbanîna her sê humayê din e, ang (reh, êkologî û rûbirûtî - nakokî), lê piştî ku ew (çand) peyda û çê dibe, dibe hukardartirîna pêkhatên kesayetiyê. Hemî zanayên entropolojiyê ji boçûna A. B. Taylor de bi dût nakevin, gava dibêje çand"ew têgeha tevayî hevedudanî ye, ku gelek tiştan di xwe de dicivîne, wek zanîn, bawerî, huner, sinç, zagon û rewîştan û hemî karînen, ku mirov, wek endamekî civakê, bi dest dixîne (1).

3. Çand bermaya kargerîna (kiryar baristeyî) ya dût û dirêj e; ji ber ku di rêveçûna wê de hinek dûmen û hêmanên çandî ye din, ku çanda civakê jê peyda dibe, bi ser ve dibin. Zanayê emerîkî Ralf Linton di çandê de sê hêmanan ji hevdu vediqetîne: Hêmanê berhema pêşesazî (berkarê pişeyî), hêmanê tevgerê û hêmanê derûnî (zanîn, helwest û nirxên hevpar). Her du hêmanên pêşîn bi (çanda diyar / berbiçav) û yê derûnî jî bi (çanda veşartî) dinavîne (2)

4. Bi derbasbûn û rêveçûna demê re, çanda veşartî dibe gurûpek nirx û zîmbolên pîroz (rewa), ku li ser wijdan û tevgera mirovan hukardar e. Ew nirx û zîmbolan jî, nemaze di demên kirîzan de, dibine yekek ji hêmanên

hevtewawîya civakê, û humayê yekirin, tebat û domdariya wê.

Duristirîn danasîna nirxan ew e, ku nirx pêwîr û mêzîna rêvebirîya çalakiya mirovane ye, her weha nirx destnîşanên rêpîvanî ne, ku li ser vebjartina berdêlên tevgerê hukardar e. Lê zîmbolên pîroz di çarçewa mîtlojiyê, û her tiştên li gel wê têkildar in, de peyda dibin, wek efsaneyên, ku mijara wan aferîner, aferîn (xaliq û mexlûq) û peydabûna gerdûnê, û her tiştên li gel paş surîştê têkildar in, wek Xwedayan û nîvXwedayan û malîketan û şeytanan (3).

5. Markis bi bîrtîne, ku ewî carekê dîrok li ser piyan rawestand, piştî ku Hîgil li ser serî rawestandibû. Ji min ve xuya ye, wek çawa Hîgil bi dîrokê re dabû û standibû, me jî bi mîtolojiyê re da û stand, nemaze li ba şirovekirina têkilîya navbera gelan û Xwedayan, lê ez weha dibînim, ku divê em berevacî wê yekê herin; ango em ji mînak (nimûne) û nirxên gelan de dest pê bikin, da bigihênin şirovekirina Xweda û nîvXweda û zîmbolên wan yê din, û li ber ronahiyê vê yekê, rastiyên ku di nava awayên oldariya wan de hene, bipelîn.

6. Entilcênsiya gelan pêşengên gelên xwe ne, ewana wijdan û dilê zindî, û hişê ramanbîr yê gelan xwe ne, ewana ew kesan in, ku dikarin bi jan û hêviyên gelên xwe hestewer bibin, ewana dikarin bibin nimûneya pîrojeya heyînî ya gelên xwe, ewana ji hemî kesên din pirtir, bi raman û helwest û tevdîrên xwe, di pêkhanîna çanda gelên xwe de hevkar in.

Belê... Entilcênsiya gelan nimûneyên payebilind û nirxên gelên xwe pêk tînin, berbiçav dikin, û ber bi jor de hil didin, da di wijdana gel de, di hişyariya wî ya tevayî de, û di giyana wî de bibine zîmbolên giyanî, bibine Xwedayên ku hemî nimûne û bawerî û nirx li hawîrdorê digerin, û jiyana pê tete organîzekirin, û wateya xwe ya, ku hêyîne şirove dike, distîne.

7. Li gor van xalên jorîn, em dikarin rîya, ku digihîne têgihîştina kesayetiya gel, di navbera berbiçavkirina rûdawên entilcênsiya wî re, kurt bikin. Gelo zîmbolên wan yê pîroz û rêzgirtî çi bûn? Nimûneyên wan yê payebilind çi bûn? Nirxên ku wan bi gotinên xwe diderbirandin û bi xebat û karên xwe diyar dikirin, çi bûn? Bi awayê gelemper, çawa li jiyana dinêrîn ? Çawa di tengasiyan, dijwariyan û çetiniyan de tevdigerîn ? Ta çi radeyê dibûne nûner û nûnertiya wijdana gel, di rabûn û rûniştên xwe de dikirin? Çiqas dikarin girêbestên ezeztîyê û giyana tekekes bişkênin ? Çiqas dikarin di giyana pêşî û neviyên gel de werine pişaftin ?

Entilcênsiya resen pêwîr û mazîna durist e, cih û rewşa gel, bi wan tete nasikirin û zanîn, çi ew cih payebilindî be û çi jî dagerîna be, çi comerdî be û çi jî dernexûnî be, çi wêrekî be û çi jî bizdokî û newêrekî be, çi sert be û çi jî jihevketî be, çi xoşmêrî be û çi nizmîti be, çi cangorî be û çi jî ezeztî

ezeztî be, çi evîniya azadiyê be û çi pejirandina koletiyê be, çi serbilindîya bi nasnameyê be û çi destberdana ji wê be, çi giyana mirovane be û çi ya dijminahî be. Entilcênsiya gel ev tiştan hemî ne, û heye ji wan pirtir be, vê lomê eger em bi rêberîya entilcênsiya Kurd, dûmenên kesayetiya Kurd, bi gelemperî, û yê giyana cengwerî bi taybetî, bipelîn, tevdîra me dê ne gaveke susret be.

Humayên giyana cengwerî ya Kurd:

Sê humayên obyektîv ji deh sedsalan de di civaka Kurd de peyda bûne, û hukarî lê kirine, û kesayetiyêke, ku giyana cengwerî rehên xwe pê de berdane, pêk hanîne, û amadebûna ji bo şerkinê, her ku helwest lê hat, tê de çikandîye (resen kir). Ew humanan evê jêrîn in:

1. **Êkologî** (Ecology): Di rûpelên berê de derbas bibû ku (çiya) daxwaza pêşdaçûnê û serdagirtinê di hundirê mirov de mezîn dike, û mêldariya lehengiyê û wêrekiyê tê de xurt dike, eger ne weha be, nikare jiyana xwe, wek ku tê xwastin, biparêze. Filozofê Yonan; Hîpokrat (Hippocrates) kevintirîn ku hevtêkilîya êkolojiya çiyayî û gewrebûna nîrxê wêrekiyê nîşan kirî ye .

2. **Çand**: Kelepûra çandî kurdî hilgir û hembêza giyana cengwerî bû; Xwedayê Arî Mîsra (Mîhr / Mîr), ku di ayîna Zeredêst de xwedayê tavê (rojê) û peymanên bestandî bû, wek xwedayê cengê dihate pîrozkirin, ta radeya ku, gava Mîsrayî li Ewropayê berî zayîna Îsa belav bû, li ba leşkerên Roma bûye bingeha perestinan. Pîre çanda Mîsra wek **sertîrê jêhaû û sawdar, hilgîrê çekan, hêzdartir, wêrek û lezoktirê Xwedayan** dihate salixdan, û dihate rêzgirtin, ji ber ku ew **xwediyê hespên sipî û rimên dirêj û tûj bû, ûrên wî lezok bûn, ku jî dût de li nîşanê dihatin**, û Xweda Ahoremezda ew ji bo **parastina tevayê gerdûna xêrxwaz afirandibû**(4).

Xuya ye, ku wijdana tevayî ya Arî, wek ku di entilcênsiyayê de diyar e, ev Xweda yê şerkar Mîsra di hizra Arî de afirand, da di çarçewa cengê de ji bo gelên Arî bibe nimûneya payebilind, û serkêş lehengiyê û amadbûna ji bo şerkinê. Gelo çi hewcedarî hebû, da wijdana tevayî ya Arî evî xwedayê cengwer Mîsra bafirîne ? Di Avesta de bersivên zelal ji bo vê pîrsê hene; pîre çanda di Avesta de hatiye, ku welatê Arî (Aryana Vîdca / Aryana Vadz) li hember dijminahiya dijminan rû bi rû bûye, lewre jî ew bi germî hewcedarê bervedêriyê bû. Di serdemên kevin de, ew dijminan ji gelên Toranî pêk dihatin. Di xelexên çuyîne jî de, me dîtibû ku gelên Toranî ji hêla rohilat de li kêlek gelên Arî diman, û her dem çavên wan li wê yekê bûn, ku bi hêla roava ber bi erdnîgariya Arî, ya berdar û kêma serma de herin(5).

3. **Rûbirûtî (Nakokî)**: Kesê Kurd, wek hemî kesên din, neçar bû ku jiyana li gor zagona (Man bo yê qenc e) bixebitîne, pîre jî dîroka Kurd bûye zîncîreke dirêj ji rûbirûtîyên dijwar, yê ku pîre

caran bûne rûbirûtiya tiratejîk a tehl, ewaya ku bi ser sê cûreyan de par vedibe; rûbirûtiya dij êkologiya çiyayî, rûbirûtiya navxweyî ya êlêti û rûbirûtiya derveyî ya dij neyanan. Civaka Kurd di van hemî pergala de hewcedara bidestxistina giyana cengewerî ya hêzdar bû, da li hember wan rûbirûtiyan bi ser keve, û heyîna xwe biparêze.

Rûdanên giyana cengewerî li ba Kurd:

Kesayetiya xwedî giyana cengewerî, çî kesayetiya tekekes be, çî jî ya gel be, daxwaziya şerkirinê bi dest dixê, pêdiviyên şerkirinê, wek wêrekî, dilêrî, û pêşdaçûnê bi dest dixê, her tim li bidestxistina alavên wê miqat e, da bi hişkberî dakeve qada cengê, bê ku encamên cengê; serkeftin an jî têkçûnê di ber çavan re bibe, jî ber ku pirs li ba vê kesayetiya pîrsa baweriya ye, ev kesayetiya jî xwe berê, radestiyê napejirîne, ma wê çawa bexariya bipejirîne?. Lê eger ew bi sedema hin nîrên dijwar neçareyî radestiyê jî bibe, ev yeka pîr naçe, dê dîsan, gava keys û nîr lê werin, rabe ser piyan, dakeve qada şerkirinê.

Ji vir û pê de, em dê li ba hinek rûdanên giyana cengewerî ya kesayetiya Kurd rawestin:

1. Xwaziya şerkirinê:

Basîl Nîkîtin gotiye: "*Hezkirina şerkirinê berztirîn rûçîkê (sîfet) Kurd e. Jiyana aza, û bê girêdan ya koçeran û karkirina berdewan ji bo çêrên şovî, an jî bo nîçirê an jî bo talankirinê, pergaleke derûnî li gel wan peya kiriye, ku ewana guh nadin çî pêdiviyên, û dij her zorkirinê serî hil didin. Jiyane kesê Kurd hîn kiriye, ku gerdûn sermiyan û arzûwa kesê wêrkê*"(6).

Bi rastî, ev xala ku Nîkîtin nîşan dike; yê daxwazên şerkirinê li ba Kurd, di dîroka pêşiyên Kurd de diyardeyeke kevna e. Welatê wan her tim armanca hêrişên talankeran bû, ewana jî bi lez li hember wan hêrişan radibûn, bê ku pîranî û hêza talakeran wan gem bike, bê ku bi bobelatên, wek kavilkirin, dîlîkirin, koçberkirin û kuştin, yê jî ber berxwedanê peyda bibin, bipûnîjin. Berî vê jî me çêla wê yekê kiribû, ku berxwedanên Gotiyan û Lolowiya li hember dewleta Akad, û ya Kaşiyên li hember dewleta Babilîyan, û ya Horiyan û Mîtanîyan li hember dewleta Hissî, û ya Mannîyan û Xeldîyan (Orarto) û Medan li hember dewleta Aşor, em weha çûbûn, ku ewana bi berxwedanê tenê nedikir, belê bi ser de jî didan ser wan dewletan û gêr dikirin, wek çawa Gotiyan dewleta Akad, û Kaşiyên dewleta Babil, û Medan dewleta Aşor gêr kirin. Diyakonov dibêje: "*ne lêhatinek bû, ku Aşoriya Med bi kesên hêzdar dinavandin*"(7).

Nîşanên daxwaza şerkirinê li ba pêşiyên Kurd gelek in; Akadiyan ewana bi (Umman-manda) navandin û bi (hêza sawdar) salix dan, her weha şahê Akad; Naram Sîn (2272-2235 b.z) gava cefayên xwe yê giran dij hêrişên Umman-manda Salix dane, gotiye: "*Xwedayên mezin weha şervanên xwedî gewdeyên wek ordekana û rûwên wek qijikan afirandine;.... Di nava çiyana de peyda bûne, heft şahên birader û berz û ciwan*". Û piştî salixdana hişkberîya Umman-manda di şer de, weha gotiye: "*Min 120000 şervan da pêşiya wan, hema yek jî jê zindî venegeyî, gava sala din hat, min 90000 şervan, û di sala sisîyê de 60700 şervan da pêşiya wan, wê hingê tevlihevî, wendabûn û şînê*

ez girtim, ez êşiyam û min keser kişandin, û min gote xwe: ezê çî ji peywerên xwe re bihêlim"(8).

Xuya ye, ku Babilîyan û Aşoriyan li şopa Akadiyan çûn, û pêşiyên Kurd yê çiyayên Zagros bi (Umman-manda) navandin, ev nav (Manda/Menda/Mend) heya îro di kelepûra kurdên êzdi de parastî ye.

Ji gotin û boçûnên Diyakonov diyar e, ku di civaka Med de çîneke şervanan hebû navê wê (kara) bû, gurûpa herî girîngtir di civaka Med de jî endamên vê çînê pêk dihat. Ewana împetoriya Aşor gêr kirin û ya Med damezirandin(9).

Sala (401 b.z) şer di navbera şahê Faris Ertazerksîsê duwem û birayê wî Koreş destlatdarê Enadolê de qewimî, Koreş piştgirî ji gurûpek sîxurên (çete) Yonan, ku jî deh heza şervanan peyda dibû, wergirt, leşkerên herdu biraderan li devera Konaksa (Cunaxa), li kêlek Babil rû birû hevdu bûn, Koreş hate kuştin, û sîxurên Yonan bi serperşîya Êkzinovon (Xenophon)(10) ber bi bakur, bi hêla deryaya Reş de vegeriyan, divyabû ewana di rîya vegerê de, di nav xaka Kurdoxên (Kordukh) Med re derbas bibin. Êkzinovon di pirtûka xwe (Enabasis) de çêla bûyerên wê rêveçûnê dike, û awayên şervaniya Kurdox, û hişkberîya wan li hember serdagirtiyên welatê wan, û dijwariyên, ku leşkerên Yonan pîre rû birû bûne, da xwe ji hêrişên Kurdoxan biparêzin, salix dide(11).

Di pey Êkzinovon re, Diyodoros jî gîha ancemekê, pîrên lêgervanên di pey wî re hatine pê bawer kirin; encama ku Diyodoros bi dest xistî ew bû, ya çêtir ew e, ku jî dêvla dagîrkirinê, Kurd li cihên wan yê çiyayî werin hêştin, jî ber ku dagîrkirina xaka wan dê sergêjyên giran, ku nîkarin bibin berdêla destkeftinan, jî împetoriyan û leşkeran re peyda bike, tenê divê, bi darê zorê an jî bi pejiwandinê, Kurd bê derfet bimînin, da gefûguran nedin deştan(12).

Di tevaya serdemên Faris, Rom, Bizenta, Erebi, Mongol, Silcoq û Osamniyan de, leşkerên ku didan ser Kurdistanê, pîngî gelek dijwariyan dihatin, û berxwedana Kurd ya hişkber û hêzdar zîyanên giran bi wan dikir. Di herdu pirtûkên xwe de (Dîroka Kurd di şaristaniya Îslamê de) û (Jîreken Kurdistanê ji warên rêvebiriyê û polîtîkê de) me gelek nîşanên vê yekê diyar kirine.

Bi rastî jî hişkberîya Kurd di şervaniya de, rikberîya pêdariya wan li hember talankeran, û destnebestana wan li pêşberî neyanan; ev tiştan hemî bûne sedem, da ew hêzên hêrişkar û talaker li ser Kurd kindar bibin, û wan bi rûçîkên qerêj, salix bidin, wek ku Kurd dirinde ne, hov in, diz in û Qeçax in (têrî ne).

Ji hêlekê de jî, xuya ye, ku mêldariya Kurd ya şerkirinê, û berxwedana wan ya giran û hêzdar, di dema talanên Îslamê de, bûne sedem, da hinek şirovekarên Qur-anê wan bixin nav milletên, ku Xweda ewana bi (xwedî hêza giran) salix dane; wek çawa di Qur-anê de hatiye, ku "*Bêje bişûndemanên Eeban: Hûn dê ji bo miletekî xwedî hêza giran werin vexwendin, şerê wan bikin, yan jî dê bibin misilman*"(13). Ibin Ebî Hatêm di şiroveya xwe de dibêje: "*Ji ber Ebî Hureyre, Xweda jê razî, di gotîna wî de (xwedî hêza giran-Ulî besên şedîd), gotiye: Ewana Beazêr in; ango Kurd in*"(14). Her weha ev wate di van şiroveyan de jî hatiye; (Şiroveya Ibin Kesîr, beş 4, rû 190. Şiroveya Edurr El-mensor ya El-Seyotî, beş 26, rû 519. Şiroveya Fetih El-qedîr, ya El-Şokanî, beş 5, rû 69. Şiroveya

Roh El-meanî ya El-Elosî, beş 25, rû 102, 103).

2. Kesê Kurd û evîna çekê:

Hevgirêdana Kurd li gel çekê di sê waran de xuya ye:

a. Navdariya çeka Kurd: Xala normal ew e, ku xwediyên giyana cengewer hej çekê dikin, bi balkêşî wê çêdikin û berdest dikin. Di jêderên dîrokî de gelek nimûne hene evîndariya çekê li ba pêşî û neviyên Kurd diçespînin, Hêrodot hinek gurûpên şervanên leşkerê şahê Farisan; Ertazerksîsê yekem, gava dane ser welatê Yonan sala (480 b. z), salix dide, dibêje: "*Kevan û tîr û rimên Med çekên wan bûn*"(15), û gava gurûpekî din salix dide, dibêje: "*Kevanê Med çeka wan bû*"(16). Jînot Wîlhêlm jî dibêje: "*Navdariya kevana mîtanî, di sedsala çardemîn de sînorên welêt derbas kiribû*"(17).

Xuyaye ku navdariya çeka Med di nav gelên roavayê Asiyayê de belav bibû, û beriya Îslamê gîhabû welatê Ereban li Hîcazê û hawîrdora wê, û bi navê çeka (mazî) di helbestên helbestvanîne wan de diyar bibû; peyva (mazî) erebkirina navê (Med / Mîdî) ye, wek çawa jî dêvla (Bexdad) Bexzaz, û jî dêla (Qubad) Qubaz tê gotin. Yek jî wan helbestvanên Erebi, ku navê çeka Med di helbestên wî de derbas bûye, El-Nabîxe El-Zubyanî ye, ku gava kesine Erebi dipesine, dibêje: "*Hilgîrên çeka Mazî di pêş de ne, ewana serbilind in, qehfan dipekînin*"(18). Û yek jî Ebdillahi Bin Rewahe ye, ku beriya Îslamê gotiye:

"*Cengeke dijawr bû, mirin di nav de xuya dibû, em wek deveyên hêzdar ber ve çûn*."

Şervanên peya, ku Mazî bi ser ve ne, kumzir li ser seran wek stêran dibiriqîn"(19).

Her weha xuyaye, ku evîna çekan pêşiyên Kurd ber bi çekirinê de têvedabûn, hin pirtûkên şirovekirina Qur-anê jîrekiya pêşiyên Kurd di çekirina çekan de nîşan dikin, wek çawa di şirovekirina çîroka avêtina pêximber Birahîm, xweda jê razî, nav êgir bi fermana şah Nehrûd.

Ibin Kuseyr dibêje: "*Paşê, Birahîm xistin mencenîqekê, ku mirovekî Kurd çekiribû, ew yekemîn çêkerê mencenîqan bû, navê wî Heyzen bû, vê lomê xweda erd/xak pêve daxist, ew jî heya roja qiyametê tê de dike qîreqîr*". Ibo El-Suûd jî di şiroveya xwe de gotiye, ku "*Nizanîbûn çawan wî bavêjin nav êgir, iblîsek hat û hînî çekirina mencenîqê kirin, wan jî çekir, û hatiye gotin, ku mirpvekî Kurd ji wan re çekir, loma jî Xweda erd/xak pêve daxist, û ew tê de heya roja qiyametê dike qîreqîr*"(21).

Rast e, ku tevlekirina kurdê bi navê Heyzen (Hewzan/Hozan) nav çîroka şewitandina pêximber Birahîm, bi mebesta riswakirina Kurd, û xistina wan nav xêza îblîsan bû, ku em bi dirêjahî di (lêkolînên dîroka Kurd) (22) li ba vê yekê rawestiyên, lê bi ser de jî dibêjim: Navdariyan Kurd jî warê çekan de di bîriya roavayê Asiyayê de rê li pêş vê hewalê vekiriyê, ew navdarî jî vedigere serdemên pêşiyên; çîmkê Mîtan bi hunerên dorpêçkirinê navdar bûn(23). Ji hêla din de, ma tête bawerkirin, ku Med, bê destxistina çekên mîna yê Aşoriyan, dê karibûna împetoriya wan gêrkirana? Ma tête bawerkirin, ku Med, dê bê hebûna zanayên pişpor û fabîkeyên çekirina çûreyên çekan, û mencenîq jî di nav de, dê karibûna împetoriyek ava bikirana?.

Di serdema nû de jî evîn û mijûliya Kurd bi çêkan ji ya pêşiyên xwe ne kêmtir e, W. R; fermandarê polîtîkî yê Hewlêrê, di dema dagîrkariya Îngilîz de (1918-1920 z) di bîranînen xwe de dibêje: "Gava jê re tê erêkirin, kesê Kurd çekdar digere, xençer û şêşperê, an hin şêşper bi kembera wî ve ne, pêre jî çar kemberên tije fişkê (berik) bi newq û milên wî ve ne, û tivingeke lûla wê zirav e, bi mil ve ye"(24), û ji hêla barandina fişkan de dibêje: "Eger fişkê peyda bibin, ewana ji hemî kesan pirtir davêjin"(25).

Nîkîtîn jî hejêkirina çekan li ba Kurd salix dide, û dibêje: "Bi rastî mirov matmayî dimîne, gava dibîne ku ewan mîrên cilên jihevketî li xer kirine, di heman demê de jî çekên herî ciwan di destan de ne, ev çi dijberiyê (tenaqud) ku li çavên mirov dikeve, gava dibîne, ku bihayê cilên wan ên jihevketî tenê çend pereyên hindik in, lê nûtirînen tivingan jî di destan de ne?!"(26). Dana Adem jî dibêje: "Di gelek çerxên berê de weha bû, ku kesê Kurd bê hilgirtina tivingê bi mîraniya tewaw hay nedibû"(27).

b. Duristiya nîşnakirina armancê: Miqateya lêdana nîşanê rûdaweke giyana şerkirîne û evîna çekê ye, Mînorîskî yê ku demeke ne kurt di nav Kurd de jiyaye, dibêje: "Çawa be jî ewana li nîşanê didin, min bi xwe carekê dît, Simkowê navdar (Simko serokê êla Şikak) Fîşekê vala bi şiqînê darekê ve kir, ew şiqîn jî dihejiya, û ji dûriya 15 gavan de berika xwe li navenda wî fişkê vala xist"(28). Dana Adem jî dibêje: "Lêdana nîşanê egera xwebaweriyê ye li ba hemî kesê Kurd"(29).

Sala (1944 z), di dema agirbestê de, di navbera lêşkerê şahî Îraqî û şoreşgerên Kurd de, rehmê Mela Mistefa Barzanî serdarê alaya Îraqê; Emîn Rawendîzî û zabitên wî ji bo firavîne vexwendin, serdarê alaya Îraqî, ku berê navdariya Barzanî bi nîşankirîne bihîstibû, xwest ku wê yekê ji nêz de nas bike, hema qutiya tutûnê ji bêrika xwe derxist, û çû dîr danî, û gote Barzan, ka berikê jî tivinga we berde qutîkê, Barzanî jî berika xwe li navenda qutîkê da, û paşê Emîn Rawendîzî ew qutîk xiste bêrika xwe û got: *Ezê vê qutîkê, bi mebesta bîranîne, heya dawîya jiyana xwe li ba xwe bihêlim*(30).

c. Çeka siwarên Kurd: Mijara hejêkirina çekê li ba Kurd dê bêtir nîma û rava bibe, eger em zanibin, ku di cengên kevin de, çeka siwaran humaya herî hukardar bû, û hesp jî di nava wê çekê de palpišta herî sereke bû, û şaxê Arî yê pêşiyên Kurd yekemîn kes bûn, ku xebitandina hespan derbas roavayê Asiyayê kir. Dr. Mihemmed Beyomî Mehran li ser Kaşiyan dibêje: "Kaşiyan komîşîne nû yên hespan derbas kirin, ji Asiyaya navîn de bi xwe hanîn. Hesp ji Îraqê ber bi Misirê dedihatî verêkirin, ewana li perwerde û xwedîkirina hespan gelekî miqat bûn, ne tenê weha, belê bi ser de jî hin kes dibêjin, ku Kaşiyan hesp û erêbe derbas Îraqa kevin kirin"(31).

Jêderên dîrokî weha diçin, ku piraniya sermiyanê Medan hesp bû, siwarê Med li piştê hespê tazî siwar dibû, her weha peyva (Asp / hespê resen) peyveke medî ye, û deşta (Nîsiyanê)li welatê Med navdartirîn deverên roavayê Asiyayê bû ji bo xwedîkirina hespan, Gava Hérodot wê deştê salix dide, dibêje:

"Mîna wê li tevayê cîhanê tune ye"

Bi ser xebitandina hêsp de, pêşiyên Kurd, nemaze şahnişîna Mîtan, érebeyên cengewerî, yên bi du tekeran jî di cengan de xebitandin . Di nava wê şahnişîne de çîna siwarî ku bi navê (Maryano) navdar bû, derkete holê, têkilîya vî navî jî li gel peyva (Mair) bi wateya (Mêr/Leheng) berbiçav e. Di serdema nû de jî Nîkîtîn dibêje: "Kurd, bi gelemperî, siwarên jêhatî ne, hemî gerokên, ku seredana deverên Kurd, yên ku hesp lê xwedî dibin, kirine, her tim çêla (qala) siwariya wan dikin"(32).

3. Kurd di nav leşkerên împeratoriyan de:

Serdarên împertoriyên roavayê Asiyayê ne tenê ji bo armancên erdnîgarî û polîtîkî çavên xwe berdabûn Kurdistanê, û ne jî tenê ji bo ku destên xwe bidin ser xêr û bêrên wê, belê bi ser de jî armanca wan ew bû, ku sîdê ji hêza şervaniya Kurd werbigirin, û wê ji bo cengên xwe bi kar bînin. Berî vî jî me bandora ku şaristaniya Horî li împetoriya Hissî kiribû, nîşan kiribû, nemaze rola siwarê Horî; Kîkolî (Kikkulî/Kak-kulî) di berpêşbirina çekên Hissî de, û pirtûka ku wî li ser perwerdekirina hespan beriya 32 sedsalan nivisandibû(33).

Farisên Exmînî ji hemî kesan bêtir rûçikên şervaniya Medan nas dikirin, ewana dewleta Med gêr kirin û şervanên Med di cengên xwe yên împetorî de bi kar hanîn. Ji bo çespendina vî yekê, hema em dikarin bînin bîriya xwe, ku şahê Faris; Koreş Harpakê Medî kire serleşkerên xwe, yên li Asiyaya biçûk dabûne ser Lîdyayê, û gava Lîdyaya careke din serî li ber wan hilda, Koreş, ji bo têkbirina serhildan Lîdyaya, serdariya hêzên Farisan xiste destê serdarê Medî Mazarîs (546 b. z miriyê). Her weha, berê jî me dabû xuyakirin, ku di cengê Maraton de (Marathon) sala (490 b. z) ya li dijî Yonanan, Datîsê Medî serleşkerê Farisan bû .

Gurûpên şervanên Med, di nav leşkerê Farisan de, li pileya duwem bû, di pey hêzên xalîdîn (nemir) yên Farisan re, û serdarê Medî Etrobat serleşkerê Farisî Medî yê mezin bû di cengê Îsos de, ya ku sala (333 b. z) şahê Faris Darayê sêyem û Îskenderê Mekdonî tê de rû bi rû hevdu bûbûn(34).

Di serdemên îslamî de, li dirêjîya çarde sedsalan, hêza şervaniya Kurd, di pirên bûyerên roavayê Asiyayê de amade û pişkdar bû, ji destpêka belavkirina ola îslamê de bigir, heya bi nakokiyên Umewîyan û Ebbasiyan, û şoreşên dij wan herdu malatan, û serdemên Biweyhî, Silcoqî, Zenkî, Eyyobî, Memlokî (Ebebozî) heya di gîrîna serdema Sefewî – Osmanî. Di herdu pirtûkên xwe de (Dîroka Kurd di şaristaniya îslamê de) û (Jîrekên Kurdistanê ji warê rêvebirî û polîtîkê de) min gelek rêberên vî boçûnê diçespînin, diyar kirine.

Di vî warî de, û li ve derê, hema em dikarin tenê rola kurd di hin bûyerên de bînin bîriya xwe; wek rola malbata Beramîke, û ya serdarê navdar Ebû Muslêman El-Xurasanî (yê Kurd, wek ku helbesvanê erêb Ebû Dulame wî bi nav dîke), di gîrîna dewleta Umewîyan û avakirina ya Ebbasiyan de, û rola Kurd bi serleşkerîya serdar Îsmetê Kurdî di şoreşa mezin ya Babekê Xurremî de di dewleta Ebbasî, ku 15 salan dirêj kiribû, û rola hêza şervaniya kurd (10000 siwar) di cengê Melaz Gurd de (463k/1071z), ya ku sultanê Selcoqî Elb Erselan tê de bi ser ket, û împetorê Bizanta; Ermanos tê de şikest, û rola hêza şervaniya Kurd bi serleşkerîya herdu biraderan Eyyob û Şêrgoh di serkeftinê Îmad El-Dînê Zenkî û kurê wî sultan Nûr El-Dînê Zenkî di cengên dij

xaçeperestan de.

Bi ser de jî em dikarin rola hêza şervaniya Kurd di hemî cengên Sulhedînê Eyyobî dij xaçeperestan bînin bîriya xwe, ji paşdextîna hêrişên wan yên bi ser Misirê de bigir, heya bi cengê Hittînê û ya rizgarkirina bajarê Qudsê, û hemî cengên di pey wê re di mezintirîna împetoriyên Ewropayê (Elmania, Firansa, Îngilîz). Her weha rola hêza şervaniya Kurd ji bo parastina rohilatê Deryaya Sipî dij hêrişên xaçeperestan, li dirêjîya serdema Eyyobîyan de, piştî mirina Sulhedîn, ji bîra nabe.

Bi ser de, tiştê hêjayî bîranîne ew e, ku Memalîkan (Ebebozan) –Şagirtên dibistana siwariya Eyyobîyan- piştî ku dawîtirîn sultanê Eyyobî (Toran Şah) sala (647 k / 1249 z) kuştin, û dewleta Eyyobî ji xwe re birin, her tim miqate bûn, ku hêza şervaniya Kurd di cengên xwe de bixebitîn. Dîrokzanê Tirk; Yilmaz Oztona weh diçe, ku leşkerê Ebebozan xwerû ji kurd hebû, hejmara wî (20000) şervan bûn, bi piranî jî siwar bûn, ev hêza hanê ji Enadolê û bakurê Sûriyeyê di hate bi ser hev kirin, û gava pêdivî heba, ew hêz bi kar dihat(35).

Her kesê bi hûrbînî serdema Sefewî-Osmanî vekole, dê jê de sayî were xuyakirin, ku ne Sefewîyan û ne jî Osmanîyan, ji bo pirojeyên destdanîna ser roavayê Asiyayê, nîkarîbûn hêza şervaniya Kurd bi paşguhên xwe de bavêtana, vî lomê hemî şahên Sefewîyan û sultanên Osmanîyan bi her awayî hewil didan, da serekên êlên Kurd ber bi xwe ve bînin, eger serekên êlên Kurd, li gor lebatên Îdrîsê Bidlîsî, nebûna mêldarên Osmanîyan, sultanê Osmanî; Selîmê yekem, dê nîkarîba di cengê Çaldîranê de sala (1514 z) bi ser keta û şah Simaîlê Sefewî bişkênanda(36).

Jêder au çavkanî:

- (1) Kemîl El-Hac: Pirtûka fireh ya hêsan (El-Mewsoa El-Muyssere), rû 168.
- (2) Gurûpekî pîrefesoran: Ferhengê zanistên civakî (Mucem El-Ulûm El-Îctimaiye), rû 119, 201.
- (3) Cemal Mecdî Heseneyn: Sosyologiya civakê (Sosyolociya El-Mucteme), rû 46. Ebdil-Xenî Îmad: Sosyologiya çandê (Sosyolociya Essqafe), rû 142. Gurûpekî pîrefesoran: Jêdera berê, rû 583.
- (4) Avesta, Yasna, Haytî 1, ayet 11, rû 45. Avesta, Yasna, Haytî 3, ayet 21, rû 57. Avesta, Yaşt 10, ayet 102, 103, rû 499. Avesta, Vîndîda, Fargard 19, ayet 29, rû 357.
- (5) Avesta, Yaşt 5, ayet 41-43, rû 408. Yaşt 5, ayet 54, rû 411. Yaşt 13, ayet 38, rû 534. Yaşt 17, ayet 41,42, rû 601-602.
- (6) Nîkîtîn: Kurd, rû 128.
- (7) Diyakonov: Med (Mîdyayê), rû 185.
- (8) Diyakonov: Jêdera berê, rû 83. Rînê Labat û hinên din: Zincîra efsaneyên Sûrî (Silsîlet El-Esatîr El-Soriye), rû 364, 368. Nîkîtîn: Jêdera berê, rû 53. Tewfîq Silêman: Lêkolînen şaristaniya roavayê Asiyaya Kevin (Dîrasat fî hedarat Xerb Asiya El-Qedîme), rû 131-132. Hedîb Xezale: Dewlela Babil ya nû (El-Dewle El-Babiliye El-Hedîse), rû 63.
- (9) Diyakonov: Jêdera berê, rû 304, 315.
- (10) Êkzinovon şagirtê Fîlozofê navdar Sukrat e.

Bîranînên Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Ebdirehman Axa Kurê Şahîn Axa Şûzî VEGERÎNA ŞÊX ELÎ RIZA LI TIRKIYÊ



Xorşîd Şûzî

Xelek – 4 –



zarowên Şêx Se'îd in, ê tirka ew bi darve kirin, û Şêxê me yê Xweyîbûn ava kir ji bo ser fîraziya kurdistanê, behwerî bi derwê dijmin bînin.. Şêx li min vegeand, got: qey Xuda welê ji mere heskiriye...

Wê şevê ez li cem wan razam. Sibê Şêx ji min xwest, ez turimbêlekî ji wan re bigrim, da herin Zaxo. min turimbêl ji wan re kirê kir, li pêşiya otêlê ji beriya swar bibin, me rû ê hev maç kir, Şêx ji minre got: hêvî heye em carek dî hev bibînin, min lê vegeand: roja qiyametê belkî em hevdû bibînin.

Ez vegeyam malê bi dilekî şikestî, bi dûre ez çûme cem Şêx Ebdirehmanê Garisî, min çiroka Şêx Elî Riza jêre got, hinek lome ji min kirin, çima min ew bi salox nekir, gote min: Ehmed, birazî, wextê em dido bana, belkî me herdiwa karîba bi hev re em wî ji wê dozê vegeandin, lê tiştê çû nema vedigere.. me reşbelegek şand ji xweyîbûnê re, li ser çûna Şêx Elî Riza û herdû birayên wî.

Piştî çendekê, despêka havînê, sala 1929 an de, rê di orta Dihok û Amîdiyê de çêdikirin, kargêrê wê endezyar bî, navê wî Ehmed Şefîq bû, ez çûme cem wî, ez xistim nivîskar li cem xwe, carna pêre diçûm ser rê, xwarin û tiştê gerekî wan bû me dighande cem wan.

Li dor çar mehan, ez mame li ser karê xwe, rojekî reşbelegek giha min ji Şêx Ebdirehmanê Garisî, têde gotibû: Wextê tu vê reşbelegê bixwînî, divê bi lez bê Mûsil.. min ji dev karê xwe berda, berê xwe da Mûsilê.

QONAXA TÊKOŞÎNÎ

Dema ez gihîştim bajarê Mûsilê, min berê xwe da mala Şêx Ebdirehman, piştî me silav lev kir, min ji Şêx pirsî: Şêxê min, xêre te wilo şandiye dî min bi lezbûn..

Şêx ji minre got:

Ez çûme bajarê Şamê, li cem nivîsgeha Xweyîbûnê, li wir civînek me kir, em gihan çend daxwaziya, a ji teva pêşkêştire, divê ehmedê şûzî û Şêx Ebdirehman herin kurdistanê, ji bo millet şiyar bikin, ta roja şoreş despê bikê, û a dûdiya em û Xweyîbûn reşbeleg di nav mede qut nebin, û a sîsiya wê Xweyîbûn ji mere belavoka rêkên, da em ji millet re bixwînin... ma tû çî dibêjî birazî?.

min lê vegeand, emrê Xweyîbûnê li ser sera û çavan.

Ez û Şêx me xwe levda, da em biçin kurdistana Turkiya, hinek belavokên Xweyîbûnê me bi xwera rahiştin, û dî peya rêber bi mere hatin, em ji sinorê Iraqê derbas kirin, me spasiya wan kir, xatir ji wan xwest, û me berê xwe da welat.

Li dor mehekê em geriyar di nav gundê Botan û

hekariyan de, me li gelek ciyan kurd didan hev, û bi wan armancê Xweyîbûnê dida zanîn, û li ser Tirka kû çî kujtarî anîne serê kurdan, û eger em ne şiyar bin, wê gelek tiştê nebaş bi serê me bikin kû em ne yek bin, divê em tev amadekirina xwe bikin ji rojekî nîzik re dema şoreşa azadiya kurdistanê des pê bike.

Piştî, em vegeyaran hatin sûrî, me ava dicê derbaskir, ji wir me berê xwe da gundê Çiftikê, em çûn mihvaniya Şêx Birhîm Heqî, Şêx bi dîtina me gelek kêf xweş bû, û ji mere got:

Xalis beg kurê Ebdilmecîd beg (Xalis beg, mezinek ji ê şoreşa A grî daxê bû), û sîpek navê wî Osman Sebrî bû, hatin cem min, şevê li vir mane mîvan darî, pîrsa we kirin, mi ji wanre got hîn ne vegeyaran... roja dî gotin ji minre: Şêxê me, gelek silavan li hevalên me bike, û ji wanre bêje emê herin gundê Hewrîzkê, cem Lîvon paşa ê Ermenî, û ji wir emê herin Barzan.. wextê vegeyaran bila bighin me.

ÇÛNA ME CEM MELE MISTEFA BARZANÎ

Bi sibehê zû re me da dî şopa wan ve, em 3 Sê peya bûn: Şêx Ebdirehman Garisî, Ehmed Şûzî, Mistefa Şernexî, em gihan gundê Hewrîzkê li cem Lîvon paşa*, gelek kêf xweş bû bi dîtina me, gote me, hevalên we çûne cem Mele Mistefa li barzan. Ji Hewrîzkê, me berê xwe da Mûsilê, û ji wir em çûne Eqre, em şevê li Eqre razan, roja dî me berê xwe da Barzan, em meşîn bi nigan, dema em nîzikî gundê bûn, me dît kû Mele Mistefa û Xalis beg û Osman sebrî, û çend peya hêdî dimeşin bi aliyê mede tîn, dema em gîştin hev me rûyê hev maç kir, û Mele Mistefa kêf xweşikî mezin da me, û em çûn koçka wî.

Li dora 20 rojan em mane li wir, wê çaxê serê zistanê bû sala 1930 an, û nîzikî miha remedanê bû, piştî gelek dan û standin em bi hev re gihan lihevhatinkê, kû em hazirîya şoreşekê bikin li kurdistana tirkîye, mele Mistefa ji me xwest nexşa botan, Osman Sebrî ji çentekî piçûk pêrebû, nexşa tirkîyê dayê.

Piştî Mele Mistefa xweşik li nexşê nêrî, û hinek pîrs ji me kirin, gote me:

ji bo şoreşa me şoreşek baş û fire be, divê kurd tev arî vê şoreşê bikin, ji bo wilo divê hîn herin Silêmaniyê cem Şêx mehmûd ê berzençî, û pêre lihevhatinkê girêdin, bo arîkariya şoreşê bike.. Şêx Ebdirehman ji Mele Mistefa re got:

belê gotina te di ciyê xwede ye, lê rê û rûbaran em nas nakin, eger nasên te li Erbîlê hebin, reşbelekê ji wanre binivîse da ji wir ew me rêkin Silêmaniyê.....

Ez şeş mehan li Mûsilê mam, min û Şêx Ebdirehman ê Garisî reşbelege rêdikirin ji Xweyîbûnê re, wa jî ji mere hinek belavok rêdikirin, me di nav millet de dixwend, û me dişandin Zaxo, Dihok û Amîdiyê ji bo millet bi doza azadiya kurdistanê ve bêne grêdan.

Dema Tirka bi avakirina komela Xweyîbûnê bihîstin, ferdariyek derxistin, têde danîn, heçî kesê ji ber xwehirmendê bazdaye karin vegeyaran ciyê xwe, ti guneh û girtin li ser kesekî nema...

Bi vê ferdariyê gelek kurd hatin xapandin, behwer kirin kû dijminê wan bi hêsanî wê ji dev wan berde, mixabin gelek hatin xapandin, ta hinek ji pêşkêşê millet, gerek nehatibana xapandin.

Rojekî li Mûsil peyak hate cem min, ji minre got, Şêx Elî Riza silava li te dike, û ana li otêla Neynewa daketiye, dixwaze tu herê cem wî li otêlê.. min rêya xwe girt, ez çûme otêlê, mi rû yê wî û herdû birayê wî maç kirin, û me bi germî destê hev hejand, me li hewalê hev pirsî, lê ez bi dil keserim bi hatina wan Mûsilê ji nîşkave.

Domeke hindik derbas bû, min di behweriyên xwede zanîbû kû tiştin hene, ne ser rastin.. min gote Şêx: xêre hûn ji Bexda hatine Mûsil, Şêx li min vegeand, û got: min herdû birayên xwe ji "dibistana leşkerî" derxistin, emê her sê vegeyaran ciyê xwe, ji ber Tirka bihûrandin derxistine, û ez diçim ji ernê (girê) Memdûh selîm re.. Tirk me bikujin ji mere çêtire.

Wextê min gotinê Şêx Elî Riza bihîstin, ez pîr xeyidîm, û min gelek hêvî jê kirin, kû ji vê rêyê vegere.. lê mixabin ji çûnê ne vegeyaran.. min jê pirsî ka di nav wede çî çêbûye, ji minre ne got, mi got: gelek şerm dikim kû ez ji xortên hêja re bêjim,

Mele Mistefa ji mere got:

Şêx Muhyedîn li Erbîlê ye, pir dostê mine, xwarziyê Şêx mehîmûd e, ezê reşbelekê jêre binivîsim.. di reşpelê de danî: ez bi hêvîme dema çar peya bighin cem te, tu wan rêkê Silêmaniyê bi saxîtî, ez gelek sipasiya te dikim.

Yek hatibî ziyareta Mele Mistefa, navê wî Mihemed axa, ji gundê Xelanê bû, ji mere got: bila Mele Mistefa reşbelekê binivîsinê ji Şêx Hacî Mistefa re, ewê zûtir we rêke Silêmaniyê.. me got Mele Mistefa reşbelekê binivîse ji Hacî Mistefa re.. gote me ez wî nas nakim lê ezê jêre binivîsim.. bi mere dû reşbelek çêbûn.

Ji cem Mele Mistefa, em li qantira siwar bûn ta gundê Xelanê, şevêkê li cem Mihemed axa em razan, roja dî bi lingan em bi rê ketin, Mihemed axa peyak bi mere rêkir, berê xwe me da Şeqlawe, şevêkê em li Şeqlawe razan, roja dî me tirumbêlek girt, û em çûne Bajare Erbîlê.

Tekiya Şêx Hacî Mistefa ji ciyê em lê peya bûn nêzik bû, me berê xwe da tekiya wî, wê rojê des pêka rojiyê bû, dema em gîştin tekiyê (Xwedê ava nekê), reşbeleka Mele Mistefa barzanî me dayê, reşpelik xwend û kir bêrika xwe û deng nekir, em birin odekê, û êvarî hinek şorba nîskê bi nan re ji mere rêkir, dû roj bi ser ketin tişte neda ber me, roja sisya piştî mêja sibehê, Şêx Ebdirehman bakiryê, û jêre got:

Şêx Hacî Mistefa, me reşpelikek da te, lê te tu vejerandin neda me, xwedê xêrkê çi heye? Şêx Hacî Mistefa lê vejerand û got: heçke emin, em piyawê xudane, îşê me ji siyasetê tune, eger kurdistan çêbe, em tu kesî ji xwe nayêxin wezîfa de, ew tiştê wehan ji mere ne gereke... dema Şêx Ebdirehman gotinê wî bihîstin, rabû ser xwe, berê xwe dayê û ji dilekî şewitî, bi dengekî bilind got: roja qiyametê milletê kurd ê sitemkêş li cem xwedê û pêxember dewedarê îmana yên wek tene, tene, bila ti xwîna milletê kurd bimijînê,

goşt û birincê bixwin, berê jinê xwede razî û şa bibî li ser milê belengazên bê hiş, û milletê kurd bila di bin zulm û zorê de bijî, lê ez bi hêvîme jixwedayê xwe kû mafê vî milletî ji te û çî yekê wekî te bistîne.. em ne hatibûn cem te, lê xwdê mala Mihemedê Xelanî ava neke, berê me da te Em ji wir derketin, me berê xwe da cem Şêx Muhyedîn, me ji hineka pîrsî li mala wî, em gîştandin cem wî, dema em derbasî hundirê dergeha mala wî bûn, ew li ber avzêlê bû desmêj digirt, rabû ser xwe û hate pêşiya me, û bi rûwekî geş û sîng fire destê me bi germî hejand, bakir zarokên xwe bo cî ji mere xweş bikin, û got: seran mîvanên delal, fermo em herin hundir.
..... Dumahî heye.

*Sedema çûna me li cem Lîvon paşa, ji ber dema Xweyîbûn ava bû, me û wan lihevhatin bi hevê kirê da, kû verastin tim di nav me û wande hebê.

Dr. Ehmed Xelîl (Sozdar Mîdî)

Pêşiyên Me Yên Zagrosî

Çavdêriya zimanî: Mustefa Reşîd

Kî Binyattir e?

"Ez, ne Sultanê Osmanî, emperatorê vê xakê me, erê, dibe ku ewa ji min bi hêztir be, lê ez ji wî bi kok û binyat û xanedantirim".

Ev gotina a serokekî kurda ye, ku di sala (1675)an da gotiye û Arşak Safrastyan (nivîskarekî ermenî ye), ev gotina di pirtûka "Kurd û Kurdistan" da aniye ziman. Min ev pirtûk wergerand zimanê erebî û sala 2007an û sala 2008an hat çapkirin.

Erê, dagîrkeran ji 2500 sal da pêşiyên me ji şaristanîyê bê par hiştine, ew neçar kirine ku bibin koçer û gundî, lê ji gotina vî serokê kurd tê xuyakirin, ku bawerîya kurdan bi xwe gelekî kûr bû, di dil û heşê wan da cih girtibû, û qet nedihat hejandin û hilweşandin.

Bi rastî, ew gotina serokê kurdan ne fort û kefa şabûnê bû, ewa gotinek dîrokî û rasteqîne, û çaxa ku pêşiyên Sultanên Osmanî yê toranî koçber bûn li biyabanên Asiyaya Navîn, pêşiyên kurdan şahnişî avadikim, û pirê caran dibûn hêza sereke di erdnîgariya Rojavayê Asiyayê da.

A niha jî werin em agahiyên şahnişînên pêşiyên kurd di ber çavan ra bi kurtî derbas bikin, emê ji nişên **Zagrosiyên kevin** da dest pê bikin û pêda herin.

1 - Gelê Gotî (Cotî):

Gelê Gotî (Cotî) gelekî çiyayî ye, dîroknas dibêjin ku welatê Gotîyan li devera ku herdu çemên Diyala (Sêrewan) û U'zým (Redano) tê rae derbas dibin, û paşê jî ber bi başûr da belav bûn, û Kerkûk û derdorên wê jî navenda welatê wan bû, û di belgeyên dîrokî da xuya dibe, ku navê Gotîyan ser hemî rûniştvanên rojhilat û bakur-rojhilatê welatê **Lullu** digirt, û gava **Akkadiyan** destên xwe dane ser welatê Somer, welatê Gotîyan jî bû armanca

armanca êrişên Akkadiyan, û dîlên Gotî wek koleyan li bazarên welatê Somer dihatin firotin ⁽¹⁾.

Lê gelê Gotî li hember êrişên Akkadiyan destbest nema, hêza hemî êlên zagrosî kirin yek, hevalbendî li gel Lullu pêk anîn û li dijî Akkadiyan serhildan kirin, û di pê ra êriş bi ser bajarê (Akkad) paytextê Akkadiyan da ajotin, û li dor sala (2230 b. z) dewleta wan gêr kirin, navenda desthilata xwe li Arabxa (Kerkûka niha) bi cih kirin ⁽²⁾.

Yekemîn şahê Gotîyan **Îrîdo Bêzêr'e**, ewa hemdemê şahê Akkadî **Naram Sîn'e**, û paştirîn şahê wan **Tîrîcan'e**. Mîrê Somer **Uto Hêgal** li derdora sala (2130 b. z) serî li ber hilda, ew dîl girt, û di dû ra Gotî vekşiyên deverên xwe yê çiyayî. Desthilata Gotîyan li ser başûrê welatê Mezopotamya 91 salan dom kir, di wê naveberê da 19 şah desthilatdar bûn.

Wek çawa ku dijminan her tim rûçikên kirêt bi ser kurdan va bûne, ev rûçikên kirêt bi serê Gotîyan da jî dihatin, dijminên wan gotin ku Gotî **"marên çiya ne, jin ji mîrê û kur ji bavê revandine, desthilaft ji Somer birine çiyar"**, bi ser jî dadijminan gotin ku Gotîyan perestgeh û serayên şahan dizîne, û bi şûran serên berxwedaneran firandine ⁽³⁾.

Helbet eva wê gotinên dijminên Gotîyan bin, qet negotina ku Akkadiyan êriş dibirin ser welatê Gotîyan, avahî disotandin û hildiweşandin, hin ji gel dikuştin û hin ji wan dîl dikirin, her der û tişt talan dikirin, û desthilata xwe bi zora şûr bi xelkê didan pejrandin. Xencî vê jî, dijminên Gotîyan qet negotin ku Gotîyan rewşa ewleyî li deverên başûrê Mezopotamya parastin, û keys li pêş bajarên Somer vekirin, da ber bi pêş da herin û di hemî war û mijaran da geş bibin ⁽⁴⁾.

2 - Gelê Lullu (Lolo):

Gelê Lullu an Lolo (Lolobî = Lolomî)- wek Gotîyan- gelekî çiyayî ye, ewa beşeke ji gelên (Zagros – Elamit) e, cîgehê rûniştina Lullu bakurê çiyayên Zagros bû, û heya gola Ormiyayê diçû. Gelê Lullu li deverên kêleka Silêmaniyê jî rûniştibûn. Kevintirîn belge li ser wan vedigerin sedsalên 28-an berî zayîne. Welatê Lulluyan bû armanca hêrişên Akkadiyan ji dema şah **Sergon** ta dema neviyê wî şah **Naram Sîn**, ango ji sala (2287 b.z) ta sala (2235 b.z) ⁽⁵⁾.

Şahnişîneka Luluyan a mezîn li dawiya du hezar salên berî zayîne hebû. Ev şahnişîna li hember Aşûriyan rû bi rû bû, û di çerxa Aşûrî ya navîn da, pîraniya deverên wan ketin bin destên Aşûriyan, û di sedsala heyştdedan da hemî deverên wan yê rojava bi navê (Zamwa) hatin binavkirin. Û ji çerxa 9-ê b.z da navê (Lullu) wenda bû, û navê (Zamwa) şûna wî girt ⁽⁶⁾.

3 – Gelê Subartu:

Bingeşa peyva **Subartu (Sobarto)** somerî ye, û erdnîgariya Subartu - li gor pergala ramyarî - teng û fireh dibû. Jînot Vîlhêlm di vê babetê da dibêje:

"Navê erdnîgariya Subartu (Suber di zimanê Somer da) her tim ne nîşana deverina sînorkirîbûn li bakurê welatê Babil, belê vî navî, here pêşî devereke bakur ji rohilatê çemê Dîcleyê digirt, û di pê ra şûna wî fireh bû, û welatê Aşûr û bakurê welatê Mezopotamya girt, û dawî jî di deqên Babilî da wek rûçikekî welatê Aşûr dihat naskirin" ⁽⁷⁾.

Ji hêlêka din da, dîroknasê kurd Dr. Cemal Reşîd, dide xuyan ku (Subrtu), wek tîrmeka erdnîgarî, ji sê hezar salên berî zayîne da derbasî dîrokê bûye, û welatê ku dikeve navbera bakurê **Îlamê** û çiyayên **Amanos** nêzikî **Deryaya Sipi** li hêla rojava, bi vî navî dihat naskirin, û deverên Gotîyan û yê Lullu di dema şahê Akkad **Naram Sîn** da, bi ser Subartu da hatin jimartin, û

û serokên wan navê (Insî Subartu) hildigirtin, Insî jî navekî somerî ye, wateya wî (Desthilatdare= Fermandare).

Bi ser da jî Dr. Cemal Reşîd dide xuyan, ku pirên deverên bakurê Mezopotamya, di tîrmên Babilî da, bi (Subartu) hatin naskirin, û hemwelatîyên wan deveran yê ne Samî û ne Hindo-Ewropî, çi Gotî û çi Lulu bûn, çi jî hin din bûn, tîrma (Subartu) ser hemiyên girt û pê ra jî (Subartu) ne navê miletekî ye, ewa navekî erdnîgarî ye, hemî niştevanên bakur (deverên jorîn) dinimîne, Farisan jî ew devera bi (Gohistan) navandin, û Ereban jêra gotin (Qohistan), û bi navê (Iqlîm El-Cebel = Herêma çiya) derbas zimanê erebî bû⁽⁸⁾.

Lê dimîne em hinekî li ser tîkelîya di navbera erdnîgariya Subartu û erdnîgariya Aşûr da bisekinin; çimkê beşekî ne hindik ji welatê Subartu bi navê welatê Aşûr, di jêderên dîrokî da, tê binavkirin û wate ewe ku Subartu cihê pêşiyên gelê Aşûr bû, û tu tîkelîya xwe bi pêşiyên kurdan ra nîne, gelo ma rastî di kû da ye?

Başê, werin em binêrin dîroknas çi dibêjin ?

Dîroknasê misrî Dr. Mihemed Beyyûmî Mehran dide xuyan, ku erdnîgariya gelê Aşûrî tîda bi cih bûye, erdnîgariya gelê Subartu bû, û dibêje:

"Eger çi be jî, Aşûrî neketin erdnîgariya vala, belê şûnên, ku ewana lê rûniştin, netewena din berî wan lê rûnistibûn, me ji wan neteweyan Subartu / Sobarto naskirîye, ewên ku berê li devera navbera çemê Dîcle û çiyayên Zagros rûniştibûn, ewana (Subartu) ne ji rehê Samî ne ...Tevî ku Babiliyan, di dû ra, pir caran cidabûn nexistine navbera Aşûriyan û Subariyan, û ewana wek rehekî jimartine, heye ku sedema wê jî ew bû, ku herdu gel - bi rêveçûna çerxan ra - tevlihev bûn, bi ser da jî hin kes weha diçin, ku Somerî berî Samiyên rojavayî li van şûnan bi cih bûn, û ji bo şaristaniya xwe ya bakurî kirin navend"⁽⁹⁾.

Hin dîroknasên din jî diçespînin ku gelê Subartu yê Zagrosî, berî Aşûriyan, di erdnîgariya Subartu da rûniştibûn, ew dîroknas wiha dibêjin:

"Navê Aşûr, berî sê hezar sal berî zayînê, li bakurê Îraqê nehatibû naskirin, belê gelên wê deverê bi navê (Subariyan) dihatin naskirin, û welat jî bi navê (Subartu) dihat naskirin . Lê gava Aşûrî hatin wê deverê, navê welatê Aşûr bi serket, û Subarî jî tev li wan bûn, û hinek jî ber bi deverên çiya da çûn"⁽¹⁰⁾.

Vêca, tê xuyakirin ku erdnîgariya Subartu - berî Aşûriyan - warê pêşiyên kurdan yê zagrosî bû, û xencî vê jî, tiştêkî din heye bala mirov dikişîne; ewa jî ev gotina Dr. Samî Se'îd El-Ehmed:

"Navên pir bajarên Somer ne somerî bûn, belê Subarî bûn (Berferatîyên pêşî), wek Or, Erîdo, Orok, Sîpar, Larsa, Legeş, û h.w.d, û eger em

bala xwe bidin gelek peyvên somerî, heye em pir peyvên Subarî di nav wan de bibînin"⁽¹¹⁾.

Bi rastî, em dibînin ku ev peyva gelekî balkêşe, çimkê berê me dabû xuyan, ku hin tîkelî di navbera Somerîyan û pêşiyên kurdan yê zagrosî da hene, û me ev daxuyaniya li ser belgeyeka dîrokî ava kir; ew belgeya diçespîne ku pêşiyên Somerîyan ji erdnîgariya Şaristaniya Guzana

(Helef) dagerîyan başûrê Mezopotamya, angî ji çiyayên Başûrê Kurdistanê dagerîyan .

Ev gotina Dr. Samî a derbasbûyî behaneyeka aşkere ye, û nahêle ku mirov bi gumanî li mijara tîkelîya di navbera pêşiyên kurdan yê Subartuyî û Somerîyan da binêre, eger ku ne wena be, ma çawa navên bajarên somerî yê sereke ê Subartuyî bin? Û çawa gelek peyvên Subartuyî ê di nav peyvên Somerî da hebin ? Ma ne pêwîst ku dîroknas û bermanas - bi teybetî jî yê kurd - piyên xwe vemalin û vê pîrsgirêkê şîrove bikin?

Cêder:

1. Diyakonov: Mêdya, rû 109. Jênot Vilhêlm: Horî, rû 31.Cemal Reşîd: Diyarbûna Kurd di dîrokê da, beş 1. rû 547. Mihemed Beyyûmî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin, rû 131.
2. Diyakonov: Jêdera navborî, rû 110. Mihemed Beyyûmî Mehran: Jêdera navborî, rû 162, 163.
3. Diyakonov: Jêdera navborî, rû 110. Mihemed Beyyûmî Mehran: Jêdera navborî, rû 141, 162, 163. Tewfîq Silêman: Lêkolînên şaristaniya rojavayê Asiyayê yê kevin, rû 140.
4. Diyakonov: Jêdera navborî, rû 110. Ebdil-Hekîm Ezzennon: Bîranîna yekemîn, rû 79.
5. Amir Silêman û Ehmed Malik El-Fityan Lêkolînên dîroka kevin, rû 102. Ebdil-Hekîm Ezzennon: Jêdera navborî, rû 75. Tewfîq Silêman: Jêdera navborî, rû 132.
6. Jênot Vilhêlm: Horî, rû 31,not 1. Ebdil-Hemîd Zayêd: Rojhilata nemir, rû 561, 562. Diyakonov: Mêdya, rû 107, 108.
7. Jênot Vilhêlm: Horî, rû 29.
8. Cemal Reşîd: Jêdera navborî, rû 429-437. Samî Se'îd El-Ehmed: Jêdera Navborî, rû 4. Mihemed Beyyûmî Mehran: Jêdera navborî, rû 142, 226.
9. Mihemed Beyyûmî Mehran: Jêdera navborî, rû 325.
10. Amir Silêman û Ehmed Malik El-Fityan: Jêdera navborî, rû 143.
11. Samî Se'îd El-Ehmed: Jêdera navborî, rû 47.

Dumahiya.....

Giyanê cengewerî yê kesayetiya Kurd

(11) G. Wêlz: Rûdanên dîroka mirovaniyê (Mealêma tarîx El-Însaniye) 2/376. Wilyam Langir: Dîroka fireh ya cihanê (Musoeî tarîx El-Alem) 1/94. Erşak Savrastîyan: Kurd û Kurdistan, rû 34, 56-57. Cemal Reşîd: Diyarbûna Kurd di dîrokê de (Zuhor El-Kurd fî El-Tarîx) 1/97.

(12) Jonasan Randil: Miletêk perçe (Ummetun fî şîqaq), rû35.

(13) Sûreyî Fetih, ayet 16.

(14) Ibin Ebî Hatêm: Şîrove ya (Tefsîr) Ibin Ebî Hatêm, beş 10, rû 3300.

(15) Hêrodot: Dîroka Hêrodot (Tarîx Hêrodot), rû 517.

(16) Hêrodot: Jêder û rûpela berê.

(17) Jîrnot Vilhêlm: Horî, rû 87.

(18) El-Nabîxe El-Zuyanî: Dîwana El-Nabîxe El-Zubyanî, rû 230.

(19) Ibin El-Esîr: Dîroka tewaw(El-Kamêl fî el-Tarîx), beş 1, rû 683.

(20) Ibin Kuseyr: Çîrokê pêximberan (Qeses El-Enbiya), rû 127.

(21) Ebo El-Suûde: birêvebirina hişê sax (Îrşad El-Eqîl El-Selîm), bes 6, rû 76.

(22) Ev lêkolînan di pirtûkekê de, bi sernavê (Awanbaziya li ser Kurd) ji bo çapê hatin amadekirin.

(23) Jîrnot Vilhêlm: Jêdera berê, rû 50.

(24) W. R: Bîranînên W. R (Muzekkerat W. R), rû 77.

(25) Jêdera berê, rû 148.

(26) Nîkîtîn: Jêdera berê, rû 269.

(27) Dana Adem Şimî: Geryana li welatê wêrekan (Rîhle îla bîlad El-Şucañ), rû 92.

(28) Mînoriskî: Kurd, rû 6. not 7.

(29) Dana Adem Şimî: Jêdera berê, rû 102.

(30) Mesûd Barzanî: El-Barzanî û tevgera rizgarîxwaza Kurd (El-Barzanî we El-Hereketu El-Teherruriye El-Kurdiyye), beş 1, rû 100.

(31) Mihemmed Beyyomî Mehran: Dîroka Îraqê ya kevin (Tarîx El-Îraq El-Qedîm), rû 300.

(32) Nîkîtîn: Jêdera berê; rû 101. Diyakonov: Jêdera berê, rû 394. Gurûpekî zanyarên Sevyetê yê bermayîyan: Îraqa kevin (Cemaetun mîn ulema El-Asar El-Sovyêt: El-Îraq El-Qedîm), rû 468. Hêrodot: Jêdera berê, rû 508. Jîrnot Vilhêlm: Jêdera berê, rû 50.

(33) Ebdil-Hemîd Zayêd: Rohilatê nemir (El-Şerq El-Xalêd), rû 473. Wilyam Langir: Dîroka fireh ya cihanê (Mewsoeî tarîx El-Alem), 1/62.

(34) Diyakonov: Jêdera berê, rû 392, 412. Hêrodot: Jêdera berê, rû 571, 616, 627, 659. Notên birê heftem, rû 102 . Wilyam Labgir: Jêdera berê, 1/94.

(35) Yilmaz Oztona: Dîroka dewleta Osmanî (Tarîx El-Dewletî El-Osmaniyye), 1/227.

(36) Yilamaz Oztona: Jêdera berê, 1/219.

Zagrosê Hajo

GIRÊ MOZAN


Marîlyn Kelly-Buccellatî û Gîorgîo Buccellatî



Cih

Vekolîna li Girê Mozan ji sala 1984an ve dibin birêvebirîya Marîlyn Kelly-Buccellatî û Gîorgîo Buccellatî de berdewam dike .

Xerîte piraniya cihê vekolînê diyar dike . Dirêjayiya girê bilind nêzîkî 600 metrî ye, bajar û derdora wî nêzîkî 1500 metrî ne û bilindayiya gir ji erdê 28 metr e. Li gor vê êdî ev cih di dema boşiya xwe de dibe yek ji mezintirîn cihan li tevayiya Sûriyê, di salên hezarê sisiyan de yê Berî Zayînê. Ji bilî mezînbûnê rasitîyê dinî balkêş, ya Girê Mozan heye, ew jî homojeniya radeya niştecihbûna wê ye: weke ko em dibînin, delîlên darîçav, yê niştecihbûnê vî cihî diyar dibin, ji serê gir bigire ta binê wî û ta derdorên derve yê bajêr jî, hê ji sê hezarên sisiyan ve yê Berî Zayînê.



Herêm

Deşta Xabûr li rojhilatê Sûriyê roleke sereke di pêşveçûna avakirina bajarvaniya kevn de leyistiye . Dibe ko wê di hin radeyan de bûye hemberê bajarvaniya bilind, ya Sûmeran li deşta heryane li başûr. Çandîni yek ji faktorên vê pêşveçûnê ye . Herêm weke îro, di heyamên berê de jî bi xêr û bêr bû. Çandîniya bi ava baranê her û her têrê dikir û pêwîst nedikir, ko cotkar zeviyên xwe avbidin. Bi saya vê axa bi bereket, bajarên nû peydebûn, û hê di destpêka dîroka şaristaniyê de ev bajar mezînbûn.

Bajarên mezin weke Chuera, Birak, Mozan û Leylên şahidên diyar, yê wê yekê ne .

Mirov dikare bi ewlekarî bibêje, ko sedema sereke ya mezînbûna hêza bajarekî weke Girê Mozan, cihê bajêr bû. Ew cih kilîta bazirganiya di nav çiyayên Anatoliyayê de, ev çiyayên bi madenê sifir (û dibe ko bi pîlê jî) zengîn û bajarvaniya mezin li, ya

başûr de bû. Di vî warî de çiyayê Mêrdînê, yê di dimenê Mozan de pir darîçav e, nîşan e; hejmara mezin, ya tiştên bronzî, di vekolînên me de, dibe ko delîlên girîngiya Mozanê kevnare bin, çawa ko dergehê bazirganiya maden bû di dîroka Sûriyê ya kevn de.

Dîrok

Weke hîpotêza kar, em goman dikin ko Mozan digehê bajarê kevnar Ûrkîş, yê ko li vê herêmê



diket û ji mêj ve tê goman kirin, ko li cihê girê bajarê Amûdê be. Ji dema ko me karîbû, em xwe bispêrine rastiya, ko girêdana Ûrkîş bi girê Amûdê ve şaş e, em dibînin ko hemû argumentên ji bona Amûdê û Ûrkîş hatibûn bikaranîn li ser Mozan (ko li nêzîkî Amûdê girê herî mezin e, yê ji dema sê hezar salî ve BZ) û Ûrkîş pêktên. Tevlî ko armanca vekolînên piştê ew bû, da diyar bikin, ko Mozan ne Ûrkîşa kevnare e, lê dîse ev cih û profilê navenda Hûriyên kevnare li hev tî: Hişkere ye ko Mozan sê hezar salên BZ gehabû radeya xweyî bilind, û du hezar sal BZ melûl bûbû û dawî gişt di nivê du hezarsaliya BZ de wêran bûbû.

Sê hezar salên BZ heyama Ebla li rojava ye, û heyama Marî û Sûmeran li başûr e. Dibe ko rengêkî taybetî ji çanda wêyî materyalî (arkitektûr û nemaze sîramîk) bi destpêka bajarvaniya Hûriyan ve girêdayî be, çaxê ko Ûrkîş weke navenda siyasî û olî, ya sereke dihate naskirin. Di hebûna bajarvaniya Hûriyan de , ya sê hezar salan BZ de hinekî dîtînen cuda hene.

Lêbelê dawîya dawî ko mirovên heyamên berê, yê li Mozan dijîn bigehine çî resenê jî, dîse rastî ew e, ko li vir bermayên bajarvaniya sûriyî kevnar darîçav in.

5000 sal BZ Till Halaf

4000 sal BZ destpêka Birak û Leylên; bandora Sûmeran

3000 sal BZ destpêka Mozan û Chuera

2500 sal BZ sûrha bajêrî hundur li Mozan; serê girê Mozan; pûtxana BA li Mozan

2300 sal BZ Akadan Birak bindestkirin

1800 sal BZ Heyama Xabûr: Herêma C1 li

Mozan; serê girê Marî û Leylên

1500 sal BZ Heyama nûzî: Herêma BH li Mozan; wêranbûna Mozan

Sûrha Bajêr

Di bingeha jêr de, girê bilî bi sûrheke mezin hatibû rapêçan . Me li du cihên gir, yê cuda vekolabû, herêma K û S1 . Mixabin, ko ew li ti deran bi mezinaya xwe, ya ko bêgoman di wextê xwe de çavên serdanvanan didagirt, nayê dîtî. Dîwarên sûrhê gelekî stûr bûn, ew ji kelpîçan hatibûn avakirin û dibe, ko bingeha wê gehabû latê (hê dive bi vekolanê were derxistin), û bircên zêrevaniyê jî li hawîrdor di sûrhê de hatibûn avakirin. Kaşekî bilindî lihevhatî ji nav bajarê nizim dirabû û digeha binê sûrhê (çawa mirov bi rengêkî ferehtir di kelehên heyama navîn de dibîne, weke li keleha bi nav û deng, ya Helebê); di dora vî girî de, dibe ko sengerekî ferehî tijî av jî hebû, lê eger wilo be jî, hê em di vekolanên xwe de negehanê. Dereng, di dawîya sê hezar salên BZ de, xwiya dike ko bajar tev dikeve bin rûdana jibîrkirî, ji wê jî hew erkê parastîyê yê gir dimêne û senger bi ax û kevirên ji avayiyên bajêr, yê hêrivtî tê dagirtin. Di parçê, ko me kolayî de, me kavilê embarekê dît, ew ji cihekî ji hundurê bajêr hatibû dagirtin û bi xitmeke giring hatibû muhrkirin, dibe ko xitma li ser derî be, dema wê jî ji nivê sê hezarê sisiyan yê BZ ve ye (Destpêka Xanedaniya III).

Zagros Haco

Ji ber berdewamiya ferehbûna demografi, gerek e bihatana xwiyakirin, ko sûrheke din di wê demê de li derbedrê bajêr hatibû avakirin: di vî warî de lêkolîn ne bi misogerî hatine piştrastkirin jî, lê ferehbûneke ko dora bajêr tev dorpêç dike, tê dîtî. Di her radeyê de bêşik e, ji lêkolînên me û ji lêgerînên li herêma derveyî bajêr, ko ew jî parçekî ava bû ji bajêr, û ko ew jî tevayiya girê bilind ji heyama sê hezarên sisiyan yê BZ ve ye. Li herêmekê li derveyî bajêr, goristaneke hemdem hate dîtî û tê de jî komeke giranbuha, ya firaxên ji sîramîk û bronz hatine dîtî .

Peykertiraşiya hezarsalên sisiyan BZ

Di cihekî şewitî de, hema hinekî li pişt mihraba pûtxanê, me peykerê şerekî dît . Peyker ji kevn bû û li gor delîlên stratîgrafî ew ji nivê hezar salên sisiyan yê BZ ve ye. Peykerên şêran di embarên peykerên Sûmeran de tene dîtî, yê ko adetên wanî hunerî ji heyama şêrê me ne, lê stîlê wan ji hev cuda ye. Sûmeran şêr bi riheke darîçav dîneqîşandin, ew rih bêhtir weke berstika cilên heyama navîn bû, û kêmkê weke pîrça ber sînga şêran bû. Gelekî stîl didane çavên şêran, weke ko yê hunermend ti caran şêr nedîbin! Dibe ko şêrê meyî Mozan ne weke yê hevrikê xweyî başûr şahîk be, lê ew ji wan bêhtir weke şerekî rastî ye. Neqşên pîrça sînga şêrê Mozan, tevlî ko hinekî gijol e jî, lê ew weke pîrça rastî xwiyadike, lep bi xwe jî hatine neqîşandin.

Bi gelemperî mirov yekser di şêrê Mozan de tîkeliyê di nav spehîtiya hesan û jîndariyê de

dibîne, ko ew tîkelî li derên din, di wê heyamê de kêr bû. Dibe ko bi tenê du şêrên ji Êrkîş, yê nîha li Motropolitan û Louvreyê ne dikarin bibin hempayê şêrê Mozan. Ev şêrên bronzî bi awayekî reyalîtîr hatine neqîşandin û bi destên peykertiraşên jêhatîr hatine çêkirin, lê mirov di wan de şengî û jiyandariyê, weke ya di şêrê Mozan, dibîne.

Li herêma pûtixanê ferşekî kevirî hate dîtin, ew ji her dû aliyên ve neqîşandî bû. Li aliyekî vî abîdeyê bi serê xwe, neqîşandineke neadetî hebû, ew komeke lawiran bû, hemû jî di haleta lebatê de bûn.

Ev jî cudabûneke tûj di nav mijara lawirên xaçkirî de, yê ji aliyê hunermendên sîmerî li başûr dihatin neqîşandin . Li cem wan lawir ji ber teşeyê xwe girîng dihatine dîtin, ji ber vê yekê jî wan ew bi awakî sîmetrî û gelekî bêliv bi cih dikirin. Di ferşekê me de neqş ne bi bang, lê bêhtir bi awakî xwezayî hatine çêkirin, ew jî dihêle mirov biheste, ko ew komek ji garana lawiran e.

Bi mijara xwe, aliyê din ji ferşekî hê balkêştir e .

Yekî cotkar, haletê wî li pey dewarên cot di dest de ye û kûçîkek di ser re hatiye danîn . Cotkar di dawîya dîmenekî de hatiye danîn û li pişt wî cihekî ferehî vala hatiye hiştin . Ev herêma ferehî vala , xêzên qurçîkî, yê ber bi jêr de beldike. Tiştê din jî yê ko dihêle ew bêhtir dramatikî be, lingê cotkarî ji erdê tê hildan e, ew weke ko ji qurçîkê hatibe. Ev berveçûna bi pêş de, bi ling, laş û serê cotkar ber bi pêş ve hê xurtir dibe û lebt di lingên dewêr de jî xwiyadike . Dîmenê ji ferşekê Mozan bi levanîna xwe, gelekî ji hunerê hevrikê xwe li başûr pêşketîtir e, yê ko li ber xwe nedidan lebatê bi awakî wilo dramatikî bineqîşênin.

Sîramîk

Dema sîramîkê pêşî ta yê dawî, ko li Mozan hatine dîtin bi tenê drêjayiya hezar û pênc sed salî dikişêne. Sîramîkên herî kevn (destpêka sê hezar salên BZ) firaxên xweşikî rengê pirteqanî bûn, ew ji hudurû ve neqîşandî bûn (weke ko li jor tê dîtin). Ji ber ko cara pêşî Sir Mallowan ew li taqê kûr, yê pêncan li Nînewa dabûn naskirin, êdî navê Nînevîte V li wan hatibû kirin. Teşeyên pêşî, yê firaxên hatibûne çêkirin, cêr bûn û piyaleyên piçûk bûn, ko

dibe ji bona vexwarinê dihatin bikaranîn. Piştî cêrên mezintir dihatin çêkirin, lêbelê êdî ew nema ji wê kîla baş bûn.

Di dema dawîya Nînevîte V de, berhemekî nû ji sîramîkên gelekî rind dihatin çêkirin, ew bi Firaxên madenî bi nav dibûn, ji ber ko bi şewtandina kîlê rengê alavên madenî bi wan diket. Firaxên madenî li vê herêma Xabûr hatine afirandin û pê bazirganî bi bakur û başûr re dihatin kirin. Firaxên bi vî rengî li herêmeke fereh tene dîtin .

Texlîtekî din ji sîramîk li herêmê bi ferehî tê dîtin, ko êdî navê Firaxên xabûrî lê bûye. Ew texlît digebe destpêka du hezar salên BZ, û ji ber kemberên ferehî ji rengên qaweyî û sorî tarî li dora firaxan, ew hesanî tene naskirin.

Di nav sîramîkên herî dawî de (ji nêzikî sala 1500 BZ) piyalên risimandî hene, yê bi navê Firaxên nûzî hatine naskirin û ew gelekî, çî li qesr û qûnaxan û çî li avayiyên cemawerî be, her li bareş û her li baxerbê Mozan jî peyde dibin. Ji ber ko ew heyama dawî ye, ya niştewaniya Mozan, êdî ew nema li herêmê tene dîtin, lê teşeyên wan nazik in û motîvên wan xweser in (li jor xwiyane).

Pûtixana şêr (Pûtixana BA)

Avayiya sereke di gir de hate vekolan: emê nefermî navê " Pûtixana şêr" (nîşana fermî "pûtixana BA" ye) li gor peykerekî piçûk, yê şêr ko li cihekî bel di hundurê avayiyê de hatibû dîtin, lê bikin. Fazên destpêkî, yê avakirinê (Faza A1a), ko hema bêje bi tevayî di vekolînan de hatiye vekirin, mirov dikare bigehêne nîvê sê hezar salên BZ (Destpêka Xanedaniya III di mijara Mezopotamiya de). Ew struktûreke mezine (15 x 24.5 m), mirov ji başûr di ser rampeke bêdûzan re derbasî dibe. Serdanvanên derbasî eywanê dibûn divabû di rêke gelekî kûr ve herin, hingê bala wan diçû ber bi rexê rastê ve, li wir li cihekî hinekî navendî, lateke mezînî (gişt 1 x 1.5 m) stûnî

hatibû danîn. Xwelî di kortikeke di serê wê de hate dîtin, û cokek jê diherikî nav cêrekî ko di erda xêni de hatibû çandin. Tê gomankirin, ko ew masa pêşkêşkirina goriyan ji xwedê re bû.

Guhertina modelê berê bû sedma avakirina du dîwaran li pey hev , û ber bi dawîya vê eywanê ve.

Dîwarê pêşî zirav bû û ji kevir bû, ew yekser li pişt masa goriyan bû, û yê mezin ji kelpîçan bû, û nêzikî dîwarê paş bû. Ev dîwar di şûna perda pişt şanoyê de bûn (faza A1b, li plan binere!) . Peykerê şêr nêzik li banî di nav kavilê dîwêr de hate vedîtin, û dibe ew di pûtixanê de di nav koma peykerên, ko nûneriya payebilindiya xwedê dikirin be.

Herdû dîwarên dirêj, yê pûtixanê nêzikî 1.6 metrî stûr in, û herduyên kin du caran ji wilo stûrtir in . Dîwar ji kelpîçan hatine avakirin û bingeha wan gehaye latê. Berazên pala dîwaran û bircên anîşkan avayiyê bi hêz dikirin û ev hemû didine xwiyane kirin, ko dive di asoyê heyama kevnare de, ew be cihê desthilat dariya bingehî li herêmê. Nêzikî 100 parçên bronzî li herêma pûtixanê hatine dîtin .

Erê, ne bi gewdê xwe, lê Mozan "Pûtixana şêr" li Sûriyê ji wê heyamê ji yê herî mezin e, ferehiya wê gişt weke, avayiya Pûtixana D li Ebla û Aussenbau û Steinau I li Chuera ye (dibe ko ew jî weke pûtixanên tîpên *atîs* bêne hijmartin). Lê di wextê ko pûtixana Ebla li gor stûrbûna dîwarên xwe ji hundurê ve gelekî zirav bû, avayiyên Mozan (dibe ko Chuera jî) ji hundurê ve gelekî fereh bûn (gişt 9 m fereh). Ev kêşeya avakirina banê xêni derdixe meydanê . Ji nû ve avakirina avayiyê, li gor lêkolînen kûrî endazyarî, dipejirînen, ko dibe formeke destpêkî, ya banên sêçîkî hatibe bikaranîn (çawa li jor tê dîtin).

Sê fazên din, yê avakirî hatine naskirin, ya dawî ji heyama Xabûr ve ye (nêzikî 1800 BZ). Vê yekê kir ko danîna avayiyên bi awakî radikal were guhertin, dibe ko bi rastî ev be sedema ko êdî ew hê ji dawîya sê hezar salên BZ ve, hew weke pûtixanê hatibe bikaranîn.

Di vekolînen bi sînor de, çend struktûrên piçûk li herêma bakur û rojhilatê pûtixanê hatine dîtin, dibe ko, ew bi erkê xwe bi pûtixanê ve girêdayî bin û dibe, ko ne wilo be jî. Li cihekî ji wan, ew ferşekê bi dîmenê cot û cotkar neqîşandî, û yê garana dilivî hatine dîtin.....

..... *Ji kovara DUGIR 3, Sibata 1996an .*



SALIHE KEVIRBIRÎ

Nimûneyeke Çêjdar ji Edebiyata Devkî ya Gelê Kurd: TÊLIYA QÎZA MÎRZE AXA



Bi qasî ku dizanim, li seranserê cîhanê edebiyata kêm gel û neteweyî bi qasî edebiyata devkî ya gelê kurd 'bedewî-delalî'ya qîz û jinê bîne zimên. Bêguman, bes çend nimûneyên sereke ji zargotina kurdî li zimanên biyanî bê wergerandin û nasandina van nimûne-belgeyan baş bê kirin dê bê dîtî ku ne kêmi 'Hamlet' a William Sheakspearê ne. Ev çi delaliya jinê ye ku di wan hevokan de tê kirin? Bi rastî jî delalî-xweşikahiyeke bi vî awayî heye?

'Çav û birûyê reş ê leglegî' çawa ne? We keç û qîzên xwedî 'Lêvên tenikî kaxetî' li ku dîtine? 'Diranê sîmê hûrê mircanî' tê çi wateyê? 'Serê memikan sor in, qoratên memikan spî ne, mîna 'Qazocaxê Ceryanî' ne!' çi tîne bîra we!? Helbet, di van gotinan de edebiyateke 'qirase' heye. Ne tenê 'bedewî'; carinan 'karesatekî' sosret, carinan 'bextreşiyekî' malkambax, carinan jî 'mêrxasiyekî' bêhempa heye.

Her wekî, bi sedan nimûneyên ji edebiyata me ya devkî, kilama ku bi navê 'Têlî' an jî 'Têliya Qîza Mîrze Axa' hatiye naskirin û binavkirin nimûneyeke çêjdar e ku ji devê 'dengbêj' ango 'goyende'yan heta îro hatiye. Min bixwe ev kilam, bi zaravayê kurmançî ji dengbêjên Serhed, Xerzan, Botan û Êrîvanê bi guherto (versiyon) yê hemû ji hev xweştir! Guhdarî kiriye. Hêviya min ew e ku kilama navborî li seranserê welêt, bi zimanê kurdî û bi zaravayên kurmançî, soranî û zazakî hatibe bilêvkin. Heger bi vî awayî be kirmançaxêv (zaza) û soranîxêv ji vê nimûneya 'çak' a edebî haydar in. Ev bixwe şansek e!

Welhasilî kelam! Wekî min êşkere kir, min kilama 'Têlî' di heft salên dawî de, ji devê çend dengbêjî guhdarî kir. Ne şaş bim di sala 1998-1999'an de, min yek ji van guhertoyan di Rojnameya Azadiya Welat de neşir kir. Kilama li jêr ku hûnê niha li jêr bixwînin, min ji devê Dengbêj Salihê Qubînî ku ji Herêma Xerzan e berhev û tomar kir, paşê jî bêtî ku dest bidim naveroka wê darêşt ser kaxezê!

Kerem bikin! Hûn û Kilama 'Têliya Qîza Mîrze Axa'...

Wey Têlî Têlî Têlî Têlî

Têlî Têlî Têlî Têlî Têlî...

Ezê serê sibê ji xewka şêrîn rabim bêjim Têlî

Bi nava rojê bibêjim Têlî

Bi êvarê, bi saetê, bi deqê, bi saniyê

Ji axîn û kedera dilê xwe re wezê bang bikim

Rabim bibêjim Wey Têlî...

Na na Weleh hey a bikeve çavê min kefa vê sabûnê

Wezê bêjim Têlî

Heta li ser singê min bibe 'çîrîna' kefen, ta û derzî

Ezê rabim bibêjim Wey Têlî

Heya li ber piyê min, li ber serê min

Cotikê kêlên kevîran hebe

Wezê bêjim Têlî

Heta li ser singê min peya bin

Cotek 'Melekê Muqerem' 'Qasidê Xwedê'

Le gava ji min sûala qebrê bikin

Yeqîna we ji Xwedê bê

Ezê cewaba van melekan nadim

Ezê pişt a xwe bidim van melekan

Dîsa ezê bêjim Wey Têlî Têlî Têlî Têlî

Le min got; Tu hûr î, boz î, beyaz î,

Xalis î, kihêl î, mûxlis î,

Ne ad û ne îmze li ber navê te ne

Wele li ber dilê min tu kihêl î

Ez vê sibê hatime mala bavê te

Nizanim çima wisa sûretê sor ji min diveşêrî

Heft birakê te hene

Heft heb xwişkê min hene

Sedema çavê te yê reş û belek

Ezê ji wan re bikim berdêlî

Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...

Lê hey lê zalimê...

Min got Têliya min lê hayê

Bejinbilinda min lê hayê

Bila qeda heftê bela bikeve

Zewacîka dilketinê

Her çar rokê dinyayê

Çiqasî malê bavê min zehf be

Bavêjim Banqê Tirkiyayê

Nizanim çima qelenê bavê te dernayê

Îsal beriya heft salan

Min ramûsanek bi tenê

Ji Têliya malikşewitî standiye

Îsal heft salê min qediya ye

Ji xwe re digirim li der û li dinyayê

Ezê rojê pênc ferza destmêj digirim, limêj dikim

Devê xwe dişom bi sabûnê, bi firçê

Ez dikim nakim

Tama ramûsana vê telesê

Ji binê koka diranê minê kursî dernayê

Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...

Lê hey lê zalimê...

Min got de rabe Têliya min lê hayê

Sed caran bi min hayê

Vê sibê rabûye vê sibê

Ji derd û kulê dinyayê

Bi tayê Derwêşî xwe girê daye

Ji xwe re digere li ser rûkê vê dinyayê

Min got Xaliqo, Rebiyo

Sibê ye ezê diçûm Mala Têliya xwe bi mêvanî

Sibe bû diçûm Mala Têliya xwe bi mêvanî

Minê li ber qûlikan û pacan

Stû xwar kiriye, ji xwe re kir gohdarî

Min dêhn û bala xwe dayê

Têliya Qîza Mîrze Axa

Destê xwe yê terî-tazî ye

Daniya ber serê kalekî heftê û heştê salî

Min dît stêrên çavên min hatine xwarê

Mînanî çem û kanî

Min got, Xaliqo Rebiyo

Mirin ji min xweştir e gelo ji vî halî

Min dî bilbilekî ji asîmanê heft qatî

Ji ser çok û çengê min danî

Bi min re xeber da

Bi tirkî, bi kurmançî, bi zazakî, bi romanî

Bi çil û çar zimanî

Digot lo lo kuro lawiko marûmo

Mexset û miradê te çi ye?

Min digot, mexred û miradê dilê min Têlî ye

Digot, na na weleh qesem dikim bi navê Xwedê

Mexsed û miradê dilê te û Têliyê

Li vê dinyayê nabe

'Cineta Baqî' gelo 'Erşê Alî'

Na na weleh kor poşman ez im

Ezê careka dinê dageriyam

Li ber qûlikan û li ber pacan

Minê stû xwar kir, ji xwe re kir gohdarî

Minê dêhn û bala xwe dayê

Têliya Qîza Mîrze Axa

Serê xwe rakirîye ji ser cih û ser balgiya

Digot, kuro lawiko, marûmo, vireko

Rûreşo, derewîno

Zozanê Bîngol û Şerefdîna Şewitî bişewite

Salek û duwanzdeh meh e

Bi ser me de bi çem û bi kanî
 Na na weleh em hê heft salî bûn
 Çardeh û panzdeh salê me bi hev re qediyane
 Em ji xwe re digeriyan lawo
 Bi qîzanî bi xortanî
 Belê kuliya serê zimanê te nexwaribû
 ‘Ava Reş’ bi çavê te de nehatibû
 Tiliya min bi çavê te re neçûbû
 Te rojekî ji nava rojan
 Ji heval hogirê dora xwe re bigota
 Dilê min di Têliyê de ye
 Wê gavê me yê bi destê hev bigirta, birevanda
 Biavêta zozanê me yê jorîn e
 Na na weleh tû yê ji min re bibûyayî malxwe
 Ezê ji te re bibûma bermalî, kebanî
 Îro çima tu yê li hal û demê min napirsî
 Ezê ketime tora vî kalê heftê û heştê salî
 Rojê carek mirin ji min re xweştir e ji vî halî
 Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...
 Lê heylê zalimê...
 Ezê aşiq û sewdaliya bejn û bala Têliya xwe me
 Va ye bi derwêşî min xwe girê daye
 Ji xwe re digirim li ser rûkê vê dinyayê
 Ez dikim û nakim
 Sebr û hewas û qinyata dilê min li vir nayê
 Min xwe berda Şamê, Helebê, Himûsê, Hemayê
 Hamûdê, Kerkûk û Kerbelayê
 Derketime serê Meka Minawer, Kevirê Tûbayê
 Hingê erdekî, temîzê miqades bû
 Dikim û nakim
 Sebr û hewas û qinyata dilê min li wir nayê
 Min xwe avêtiye Girê Erefa yê


Ciyê hêvî û dûayê
 Na na weleh minê xwe berda Şarê Îraqê
 Serê kûçe û mehelê vê Bexdayê
 Minê dêhn û bala xwe daye
 Qizikek rûnişti ye, li binê dara darçinarê
 Sûretê Cizûyê, Yasîne
 Mane dike rûpela mibarik a vê Emayê
 Digot lo lo kuro, lawiko, marûmo
 Çima wisa li min dinêrî
 Navê min e, ji min re dibêjin ‘Meyremayê’
 Belê were di kêleka min de rûnê
 Wezê wê gavê deynim Sûretê Cizûyê, Yasîne
 Rûpela mibarik a vê Emayê
 Digot, sed û yek salan
 Tu di kêleka min de bî
 Tu car û tu car mirina malîkşewitî
 Her çar rokê dinyayê
 Li bîra te nayê
 Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...
 Min got lê lê zalima qîza zaliman
 Qesem dikim bi navê Xwedê
 Sed û bîst hebê weka te hebin li dinyayê
 Neynûkeka Qiza Mîrze Axa pê nayê
 Le lê lê zalimê min got bihar e
 Bihara me rengîn e
 Li ser rîya me Zozanê Bîngol e
 Nemrûd e, Serhed e, Şerefdîn e
 Birek malê bavê Têliya min bar kirine
 Danîne li Zozanê Xazovîzo
 Li Qûntarê Sîpanê Xelatê danîne
 Hespê binê min kihêl e, rewan e

Şopê malê vedigerîne
 Min dêhn û bala xwe daye
 Sê konî li Beriya Jêrî danîne
 Ma cotê konê pêşî kes tê tunîne
 Min ajote konê navîn e
 Min bala xwe dayê sê zerî ne
 Bi çav û birûyê reş ê leglegî ne
 Bi dev û lêvên tenikî kaxetî ne
 Bi diranê sîmê hûrê gelo mircanî ne
 Weleh serê memikên wan sor in
 Qoratên memikên wan spî ne
 Mîna ‘Qazocaxê Ceryanlî’ ne
 Li ser masên zêrî û zîvî ne
 Zincîrên dorên wan xalis û mûxlisên Reşadî ne
 Belê ji hikmê nivê şevan û pê de
 Ji xwe re çay û qehwê dikelîne
 Ez evdala ya ortê me
 Navê wê Têlî ye
 Qey mîna ev her duyên din
 Jê re bûne kole û xizmetçî ne
 Weleh yek jê çay û qehwê dikelîne
 Ya din rahiştîye destmalê
 Li serê dike bayê bawêşîn e
 Weka qaz û qûlingê Beriya Jorîn e
 Belê salê carekî
 Serê xwe li Zozanê Bîngol û Serhed û Şerefdînê
 dertîne
 Yeqîna we hebe ji Xaliq Rebê Alemê
 De çiqas jinê çê hene
 Temamî qismetê mêrê kotî ne
 Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...
Ji erşîva Salihê Kevirbirî

Hazim Ehmed

Gurzek ji gulên nesrîn, bi te dim periya min
 gurzek kû her çar demsalan şîn bi mîne, û bihnek xweş bi de
 ji buharên welat hilkim, û di buhara dilê te de biçînim
 da tu bi be nesrîna min jî, û ez te bihin bikim û ji hilma te bi helim
 periya min, yanjî nesrîna min....
 ji bo te..... ez xortek dînim, di evîna te de wînda me
 ji bo te..... ez xortek dil bi xwînim, di eşqa te de mirî me
 ji bo te..... ez xortek bextewarim, di derya çavên te de ez mînim
 li hember bejna te, dikim bifrim, ji dunyayê mijûl di bim, her tiştî ji bîr dikim
 ax nesrîna min, tu bûye sedema hemî xewnên min,

Gurzek ji gul



bê te ez mirovek sarim, bê hiş û bê dengim.
 tu jiyane di de min nesrîna min.
 tu wateyan di de helbestên min.
 tu gotinan di bêje dilê min.
 tu hiş tîne serê min.
 tu jiyane di de min jiyana min.
 tu dengê dile.
 2013.11.12

Boniye Cegerxwin



Reva ji sînor

Şevêk ji şevên
cehzeranê bû

Şeveke giran
reş û tarî bû

Ez û dayka xwe
Xuşka min Rojîn

Selam û Azad
Sînem , Gulperî

Me da ser şopa
Du kurdên rênas

Dilê me teva
bi coş û taswas

Çawa ew diçûn
em li pey wa bûn

J' ber ku di rêde
Em ne aza bûn

Sêzde salê bûm
Gênc û ciwan bûm

Ez bi hêvî bûm
Her bi saman bûm

Heryekî ji me
Sîber ek,hebû

Kesek ji me pêve
di wê rêde nebû

Sergêj û bi jar
dil êş û janin

Çilo em diçin
qet em nizanin

Rengê wê şevê
ez pir hejandim

Dengê kûçika
Ez Pir tirsandim

Rêçek pir dijwar
Em têde diçûn

Ta l' me bû sibeh
em di rê de bûn

Axek ajotî
Tert û tevîhev

Lingên me li nav
Geh meş û geh rev

Bi tirs em diçûn
bê pasport û mor

Ma para me ye
tim sitem û zor

çi gav me davêt
Me j' xorta dipirsî

kengî em dighên
pendî, bê tirsî

Wan serî dihejand

Her xwe dikenand

Ew rêça dirêj
bi tirs me bûrand

Em pir têşiyar
herdem d'giriyan

Ji pirsê êdî
Em tev westiyar

Tirsa polisan
kete dilê me

Lêdana bavo
hat ber çavê me

Lê ji nişkave
gotin va sînor

Em tevde kombûn
li wa hawîr dor

Eve Maseka
gundê kurdane

êdî metirsin
ev Kurdistanê

Malbata Bozê
li gil gundiyan

Hatin pêşya me
li me civiyan

Em hambêz kirin
Gel peyvên şêrîn

êdî ne tirsin
zarên Cegerxwîn

Xwarin j' mer anîn
livîn pir danîn

Em ketin xewê
Biste û bi vîn

Dema şiyar bûn
tev disa hatin

Stiriyên lingê me
wa tev kişandin

Bi dilekî xweş
dem afirandin

Bi pirs û çîrok
me roj bûrandin

Ta em çûn Bexda
Jîn hat guhrandin

Hembêza bavo
Em tev civandin

ew şeva dijwar
qet jibîr nakim

Çawa tirsê wê
ji ser xwe rakim

Ta hebim li jîn
Wê l' bîra min bî

Gelo wê tehlî
tim para me bî?

Can kurd

Tu kîyî?



Dûrwelato, tu kîyî?
 Li ber bad û bahoza neyarî
 Li şergeha mezin
 Li ber çerxa kevin
 Tu çiyî?
 Vaye di ser serê me re
 Ewirêd bi Sinf û Sarînê
 Ketine semayê, hatine civînê
 Di çarexê me re
 Di nav me re
 Marêd leşgiran, tofan
 Xwe veşartine di nav pûşê havînê
 Dikevin lûs û hêlûnê...
 û jehra wan, kes nebînê, kes nebînê...!
 Dûrwelatê pîr û hejar serî hejand,
 hêstirek rijand
 keserek kişand, lorand û kire hawar...
 Ez mitekî diriyên çolan im
 Ketime çavêd neyarî
 Ez bûme hespekî kumêt
 Dibezim li her warî...
 Bo dilketiyên welêt
 Ez bûme siha dareke çinarê
 Cobareke avxulxulî
 li rojek biharê
 Ji bo rêwiyê tî me
 û ji bo evîndariya lêvên zinarî...
 Ez bûme kaniyeke ava kewserê
 û çiraxeke şeva tarî.....

Qadoyê tehl û tirş

Qado Şêrîn

Li hev hûnandina Kukumê Xwedê -01/2011
 Qadoyê me yê delal
 Dîsa te xêre?
 Tu kar dikî, ji kê re ?
 Tu dev davêjî şêrên me yên têkoşer
 û wan pehlewên seraser,
 ...ku kêşeya me difiroşin li bazarê
 Te jî paldayî,
 Tu tew naçî hawarê...!
 Çi hatiye seriyê te ?
 Kê evqas bîreya Heineken berdaye nav mejiyê te ?
 Te xwe li ser me kirî dikê Misirê ?



Tu dikî bifirê ?
 û te xwe di qada rexnegiriyê de kiriyî leheng
 Hergav û her dem tu dikevî ceng ?
 Ma qey te destûr ji me standî?
 Te dara xwe ya bejinbilind li vê ortê çandî ?
 Te hespê xwe yê kumêt bê fermana me
 Ji tewlê berdayî û bezandî ?
 Tu çi dixwazî ji Ata ?
 Tu li çi digerî, li van sirta?
 Ma tu natirsî ji Xwedê ?
 Yek ji nişka ve li gelçimê histoyê te bidê?
 Ma tu nabînî ruhniya „Serxwebûnê“ ?
 Pertava wê belav bûye li gerdonê ?
 Heger tu bawer nakî,
 Kuro, here bipirse ji Ergenekonê...!
 Qdoyê tehl û tirş, lo dilo,
 Tu jî wekî Eynoyê Dîkê
 Wekî Yehya Silo...
 Bi tevir û kêseran
 Daketî hember çandeperweran
 Tu rexne dikî li helbestvan
 ...û wan devkewseran...
 Ewên ku rûyên xwe dane xorşîda royê
 ..û wefadarin ji bo serokatiyê...
 Dixun savarê li aşxaneya belaş
 Digerin li koşkên televîzyonê bi berçavk û kilaş
 ..û vedixun çaya bi hinxaş...
 Tew tu têdigihî ewan çi dibêjin ?
 Ma tu nizanî ku ewana bûne stûnên baweriyê
 Xwedanên dîrokên ji mêj in ?
 Qadoyê bejinbilind, êdî bese !
 Rewşenbîrê wek te, her bê kes e
 Were tu jî seriyê xwe wek me biçemîne
 Tu jî baweriya xwe bi "Ata" bîne
 Ew dostê me yê mezin e
 Ku çi kes wekî wî nine...
 Ewê ji me re „Hukmê Îdara mehelî“ ji Erdogan bistîne
 ..û ewê ji me re taca seriyê me ji nav tozê derîne...
 Ma qey tu nabînî li başûrê pir û pir piçûk
 Hêja Hemîd Haj Derwêş bûye" Şervanok"
 Nameyek rakiriye ji bo "Serok"
 ...Têde aniyê zimên axaza gelê me
 Serok Esed jî gotiye: "Li me biborîne nezaniya me
 Qey rast Kurd wilo li Sûriye blindest in ?
 Qey em wilo mirov in kevneperestin...?
 Ey serokê partiya zor Teqeddumî

Ez ji niha ve mafê Kurdan didim..
 Yek bi yek, wan mafan hemî..
 Tenha bila Qado dev navêje me
 Tema ez jî Ata yê we me..
 Keko, ji vê xweştir çi heye ?
 Bo çi her gav û her dem xirtepirta te ye ?
 Wekî ez dizanim,
 pêûsê we hinekan egera koletiya me ye...
 Ji roja tu hatî dine de
 Tu belaya serê me ye...

Şehrezad

Ta berbanga sibê
 Çêrokan ji şahê xwe ra dibêje
 Çêrokên bi fantazî û tijî evîn
 Li razanga xemrevîn
 Bi derketina royê ra
 Li asoyê rengxwîn...

Şahê xwe yê pîr dike xewa şirîn
 Hema di dilê wê da...
 her heye sohtîn

...û di çavan da girîn

Divê çêrokeke dî

Bo şeveke dî...

Wek sihirbazan ji tunehiyê pêda bike

Da seriyê wê roja dî neyê birrîn

Hezar şev û şevê e

Şehrezad çêrokan çêdike

Şahê pîr her û her ji wê hez dike

Jî nê wilo bi efsaneyan derbaz dike

Dilê wê yê biçûk belengaz dibe

Dê mê sorgulî roj bi roj zer dibe

û kaniya çêrokên evîniyê zuwa di be

Da şah di xew keve

Tirsa tarî û tenahiyê ji çavêd wî bireve

Şehrezad dê her û her çêrokan bibêje

û cewherên xwe yê giranbiha

bi ser balifên wî da birêje

Ma jî na belengazan dê her weha be

û çêrokbêjî wê her karê geda be

Na na Şehrezad nema devê xwe vedike

Nema çêrokan dibêje û derewan pêda dike

Tok û zincîra koletiyê ji lingêd xwe davêje û tirsa xwe tune dike

û gerdenê xwe yê mermerî

ji bo xencera mîterê dilkevirî

bi serbilindî tazî dike

Mizgîn Hesko



Sirûda Şehîdan

Şehîdê min , findê vêxe

Refê xortan bi firê xe

Şehîdê min çirê vêxe

Berê keşan bi xemlê xe

Çiyê te ye jor û banî

Heyveron û stêr canî

Berê xwe bide ne miran

Se.îd -Qadî û Berzanî

Vedenga Maşûqê kurdan

Bişrîna dê mên nûranî

Silava dayik û bavan

Xetîra şevên giranî

Hêsrâ Qamişlo û Hewlêr

Herikîna kilê sibhanî

Hêsrâ Amed û Mihabad

Vedenga Ahmedê Xanî

Şehîd sirûda azadî

Ji bo dozê tu xelatî

Xumxuma pêlên Feratî

Xuşîna darên welatî

Siwarê tirs û bahoza

Agirdadê pêt û doza

Hezkiryê esmer û boza

Ronaka cejn û newroza

Şêrê Helepça û Şingal

Mîrê Qendîlê şepal

Neviyê Sînem û Enfal

Roboskiyê Rustemê Zal

Xêzên destên min hozanî

Mizgîn megrî tu biyanî

Soz û peyman Kurdistanî

Şehîd hel best û ramanî

Bêwar BARI TEYFURI

ŞOREŞKERE



Dil birîne ji vê rewşa Kurdistanê zare-zare .
 Kanî loxman, kanî hekîm dil qenc bike pir bîmare.
 Ji war dîrim ne xandari m dujmin hertim koledare,
 Zîtol-zîtol kirin welat bindest maye şermekare.
 Ez hejar mam li dunyayê neyarê min pir bedkare,
 Kuda diçim ez xerîbim hela dost jî sextekare.
 Bengizê min xitimîye rozgara min dest zebtkare,
 Dunya alem jî eyane dujmin ra tim hevalkare.
 Tek û tenha bê refîgim birê min jî bê îtbare,
 Pêşberî min neyarê min hezar sale bê hejmare.
 Yektîya me, şoreşa me ji bo welat berxwedare,
 Azadîyêra jîyanêda xwîna mêran rikindare .
 Rizgarîya niştimanê fedekarra hêvîdare,
 Vê oxrêda her kes ê kurd xwîna xwe va tim deyndare.
 Ji rewşa kurd Kurdistanê ji dil Barî birîndare,
 Melhema wî azadîye rizgarîyêra zulfeqare .
 Ne serdare, bê xandare, bê rozgare pêş neyare,
 Ne rizgare evîndare li meydana têkoşere .
 Cîhan durî û gemare dijî kurdan tim dilsare,
 Rastayê re jîna nû re Bêwar Barî şoreşkere .
 18. VI.2000 . BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ.
 Ji bona her kesek yarek heye ê min welat yare,
 Belê çî bikim di destê dujminê xwînxar û xedare .

Cîgerxwîn

Belê ey Cîgerxwîn ê mezin yara te Kurdistane,
 Bê wîsal, bê nefesa te hê jî nexweş û bi jane.
 Rewşa wê kul kir laş ê te û gel ê te hezar sale,
 Bo qencbûn a wê tenê tu na nevyê te jî dinale.
 Çi tê dest me wekî gel ê me hê cavgirtî xizane,
 Hela hê serwext nabe ku pêş me gunehkar cîhane .
 Me na dujmin bawer dike qe fîla neyar nizane,
 Rehm nakin me dukujin bextê me di destê dizane .
 Bindestîya welat timê derd, kul ê me hemûyane,
 Xwîna me û yekbûna me azadîyêra dermane .
 Bêwar Barî bê yar maye ji dunya fanî dinale,
 Pêşerojê bawer dike wîsala yarê gumane.
 *** **** ** *****

Ew dîlana tu dibêjî jê nehat dengê şirîn, xweş,
 Nav sextekaranda mame dîrî yarê bûme hûr-xweş .
 Pir yên xwendî zane, zanyar neyaran ra dost, dildare,
 Bi zanyarên muxennet va gel hercar sêfîl û jare.
 Gelê bê savad, bê xwendî kamran nabe tim stûxare,
 Li bin hukumên nepakan bi qurna va tim xeware.
 Zanyar Şêro, sextet Kemo, yek jî Xêro û bejn dirêj .
 Neyara ra xizmet dikin gel ê dil saf kirin ker-gêj..
 Mecal nadin pêşda here û hev bigire gel ê bindest.,
 Namûs, şeref tew firotin van tirkan ra bûne berdest .
 Destê min nafêhje jîndarê hîcrana wê min ra yare,
 Bêwar Barî bê wîsala weha dijî ax bê pare.

** ** ** ** **

Rêya diçe ber azadîyê hela hê mera xare,
 Yên ser rê rawestîyane hundirê wan pir gemare..
 Ji rêberên gel jî gellek yên bê feydene xedarin,
 Fehm nakin qut dibe qurne ya me jî îdî ev care.
 Bûne xulamên dujmina dixapin pesnên bedkaran
 Êcê nezanên hana de dîlbera min birîndare .
 Dost û hemdem peyda nabe zeman jî mera xedare,
 Bi dîlbera min ra hertim neyar dileyze dîyare,
 Cîgerxwîn jî debar nekir dît ku dewran jî firare,
 Bi guman lê bê par çû lê dît bira jî bê îtbare.
 Bê wîsala wê dîlberê Bêwar Barî ne rizgare,
 Tek û tenha li dunyayê roja geş ra hêvîdare .
 ** ** ** ** **

Cîgerxwîn pir kir nale-nal ji bo hesreta tacdarê,
 Nalînyava şîyar kirin ku em dest bidin ser yarê.
 Vê oxirêda xwe feda kir evîndarê dildarê,
 Rêça wîda ez dinalim keti me bi dil vê dîlanê .
 Lê govendêda nadin min bo serkêşîyê desmalê.
 Ku ez hêza xwe pêşkêşî m bo kubarîya dildarê.
 Ku pêwîstbe ez ê jî zû vî laş ê xwe bide m feda,
 Tenê bila ken zû were li bengizê zindîdarê.
 Bengiz ê wê jî bê ken maye terê bengiz ê bilbil ê wê,
 Nalînyê me ji esmana ewr jî anîn gellek xarê,
 Lê çî feyde hela hê jî cave yarê rê dikşîne,
 Bêwar Barî keribîye ji wîsala wê ruhdarê
 Hela gellek hê nizanin tama wîsala tacdarê,
 Lema jî ew bê baldarin ji meydana berxwedare.
 ** ** ** ** **

19.V2000 . BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ.

Beyar Robarî

Karê zanan



Kurdo raweste li ser pêyan
Gavan bavêje wek zanan
Bi hesab û bipîvan
Ev fersenda tim netê ber destan
Rewşa Rojavayê Kurdistanê, nazik û bargiran
Ji me tê xwastin, yekîtiya helwest û siyasetan
Avakirina sazî û hêzên pêşmergan
Û hildana yek al û bêlîkirina sînoran

*

Kurdo avake Rojava
Bilez û bez me divên:
Çek, pêşmerge, çapemenî û peran
Karê xwe bike wek zane û şêran
Neyar li pêş û paş mene
Çavên wan li gavên me ne
Bawerî meke bi Tirk û Faris û Ereban
Erebên li ser hukim û opozisyûna roja hîro
Jibo Kurdan wekhevin
Dev qerêj û bêbawerin
Soz û peymanên wan, tevî derewin
Ew ji berê de, xwedî xapîn û falin
Hîro û sibe, ew ji me re neyarin
Jibo wan Kurd nehevparin
Tenê bes, em xizmetkarin!
Kurdê zane, ev dîrok û bûyer ji bîrê narin
Kurd hîro wek duhu, bê dost û palin.

27 - 08 - 2012



Dîwarê şermê

Dîwarê şerm û dij mirovahiyê
Tê avakirin ronka riyê
Li ser xaka Kurdistanê pîroz, li Cizîrê
Bi destên Tirkên stemkar û xwûnxariyê!
Dixwazin kurdan jihev bikin, bi bêton û têl dirî yê
Û mîrşîna Telebanî û şêxangeha Berzanî,
Li hemberê dikin bêdengiyê ...!!

*

Dîwarê şerm û dij mirovahiyê
Avadikin Tirk bipîştgiriya nasên fûte û riyê
Û laliya Yekîtiya Ewrûpa û Koçka Sipî yê
Dixwazin Rojavayê Kurdistanê têxin tengî yê
Û bigirin li pêşiya wan rêya azadî yê

*

Dîwarê şerm û hovîtiyê
Dîwarê qerêjên tirkan digrin li Nisêbînê
Kesê nebîne vê rastî yê
Mela devê xwe bigire û neke bênamûsiyê
Û naxive li ser mafê mirov û îslametî yê
Û nebêje em dixwazin aşî tev kurdan û biratî yê!
Kurd nedînin baweriyê bikin bi va fêlbazî yê.

07 - 11- 2013

Dilşad Mella



Kezêba dilê min

Li ser hespê hesin
Daxînin vê darbestê
Li ser hespê hesin
Daxînin kezêba dilê min

Bila bibînim
Riwê mêrxasê xwe
Da ji min re bixwîne
Helbesta xwe ya dawî
Ji min re bêje kî bû
Lehenga çîroka evîna wî ya dawî...

Gelo çawa

Gelo çawa

Gulleyên xwe

berdidan canê te yî nazik bê destûr

Gelo çawa Karîbûn

Li çavên te binerin

Gelo çawa karîbûn

Buharê bikujin

Gulan biçilmisînin

Gelo çawa

Gelo çawa...

Hoooo tembûrvanê mino
De ka dîsa min bigrîne
Bi zîzbûna tembûra xwe
Bi nalîna dengê xwe
Bi strana
" Hey bilbilê dilşadî "!
Lê, te ez herifandim
Bi barkirina xwe
Bi dûrbûna xwe
Bi nebûna xwe

Ehmed Mustefa



SÎNEMA AMÛDÊ



**Dayika Şehîdan (Ferîde Elî)
Tu megrî**

Ax ev çî qêrîn e!
Çî Şewat e çî birîn e
dil bi fîxan û nalîn e
feleka bêbext bi kîn e!
Dayika Şehîdan tu megrî
Dayê Dayîka min Dayîka şahîdan e
Îro li me fermane agir û dûman e
Zarokên me şewitandin ax ev çî talan e
Sînema agir pêket wax ev çî zeman e
Dayika Şehîdan tu megrî
Zarokên me şewitandin ji kîna sala ye
Biçûk in, bêguneh in dana Xuda ye
Ey Xuda tev perî ne ma ev çî ferman e
Li ser Bajarê Amûdê
sala 1960 î qêrîn û halan e
Dayika Şehîdan tu megrî
Sed aferîn Ey dayika Ferîda
Bi şanazî tu Dayika Şehîda
ji agirê sînemê te zarok pir riha kir
dilê gelek zarokan bi jîne te şa kir
Dayika Şehîdan tu megrî
Hawar e heyî hawar e
Tu ji bîr naçî tucar e
Hawar e heyî hawar e
kurd birîndar in dil bê derman e
Dayika Şehîdan tu megrî

Çavên te

Çavên te ?.....
ronîya herdu çavên mine
Bila Fermêska nebarîn in
Çavên te çîçek û nêrgizin
Asimeneke ji berfa spîye
Zozana çîyayê zegrosê ye
Buhareke ji Gangulokên sorên
Çavê te Tebloyeke
Ji rengê gulên buharêye
Ne hatîye çêkirin
Û ne hatîye Afrandin
Çavê te helbest û kilame
Gelawêja li ser dilê
Simbula Azadîyêye
16.11.2013

TE JI BIR NAKIM

Dengê te xweş tê guhê min
Stran û awazên te
Ehmedê Min
Ey bilbilê dilşad
Barê te giranbû
Xemgînya te pir bişewat bû
Tu xortekî jêhatî û jîr bû
Serfiraz û serbilind bû
Tu dengê gelê xwe bû
Dengê bilbilê şeyda bû
.....
Tu çîya bû
Tu lat û zinar bû
Tu taca serê Keç û Xorta bû
Tu Stêr û Gelawêj bû
Tu şêr bû
Tu piling bû
Tu mêrxas bû
Tu Têkoşerê gelê xwe bû

Tu dil û cerg bû
Tu dilê Welatê xwe bû
Te em hiştin hejar û perîşan
Êşa te qaserî êşa Welatê min bû
Tu kevokê Aştîyê bû
Ey bilbilê çîyayê welatê min
Tu hêvîya 40 milyon dil bû
Tu Qublet nema ya çar perçên dil bû
Tu kurdistanê bû
Tu Ehmedê Min bû.
Ji bo Hunermendê nemir Ehmed Kaya û
13 mîn salvegera bîranîna wî ez vê
helbestê dîyarî wî dikim û bejna xwe li
ber gora wî ya pîroz ditewînim.
16.11.2013

TU WISA XWEŞEKÎ

tu wisa xweşekî delal û naz î
li ber dilê min tu wisa can î
çê qas şêrîne bejin û bala te
gule nêrgize berfîne dil e
tu wisa xweşekî rind û bedew î
çavên bi ken saz û awaz î
tu Gewhere vê canî tu ronahîya vê jîne
tu hêvîya vî dilî tu kilama mem û zîne
ger tu wisa dil û cerg perça bik î
kul û êşaa li min pey da dik î
ger tu birînin min vedik î

tu dilê min perça dik î
ger wisa tu li min bik î
tu mirina min nêzîk dik î

Dixwazim tu hevala min bî
hevala jîna min bî
Umrê meyî ji bo te bî
2013.11.23

Alan pîr Mem



Lîborîn

Lêborîn
 dîr ketim
 dil maye bi xwîn
 kûr ji can
 der dek giran
 şewatek bi nal
 lê her mayit ew evîn
 lêborîn.....

dûrahî
 ronahî
 herdû çav mane bîranîn
 semawend
 leylan û rê
 kêf û axîn
 lêborîn.....
 nizanim
 li ku mamim
 ji te.....
 ji xwe.....
 ev awat çawa furaq
 bûne narvîn
 narîvan
 bêhna tesira bayê şemal
 ev cîhan li me pirsî

dîden û dîdar
 li me kom bûn bi girsî
 lêborîn
 ew kula min hişt
 himber nayê bihişt
 lê çibkim
 ke evehizkirin û sewdaserî
 nala şewat
 ke tu bû sirgûn û welat
 roja me vaye
 dîsan hilat
 bi lêvegerîn
 lêborîn .
Kurdistan- Duhok
 3/11/2013 Z

Xorşîd Şûzî



RAMÛSANÊN JÎN Û ... MIRINÊ

(1)

Maçek ji pencera pistînê hel bû
 Di nav sikakên lêvan de bi hna xwe veda
 Hêsiyek rêt û xwenek nîgar kir
 Di bin kûrahiya tariya bihnkişînê de
 Kulîlkek nû ji ber tenahiyê
 Di nav şanoya malzarokiyê de, dinaliya

(2)

Maça mirinê ew bi germî hembêz kir
 Wê bi qêrînan gazî jiyane kir
 Ji jana wê maçeke serhildêr vejîya
 Ew guheste jiyana zindiyên
 Di guhê wê de piste pist kir ..
 Raweste .. Aram be
 Ji kaniya memikên pîroz
 Ku roniyê li gerdûnê belav dike
 Ezê te bi hilma hêviyan dorpêç kim

(3)

Maçek xewnên bê hêvî jêre dipistîn e
 Bi dînahî bi rûçkê wê dilîze
 Wekû ewreke vînê ya ji axîna...
 dîr bûna hev dîtinê birîdarbûyî
 Wek keziyên mendala..
 Ronahiyê ku parçe parçe dibe
 Wekû stêra berbangê
 Ku naxwaze roj derê

(4)

Maçek helbestên mirinê rêz dike
 Azar û nalînên westînê,
 Keriyên êş û janan der dike
 Mendaliya wê salane sêdar dike
 Gorek di sîngê de kola
 Û axa tinebûnê biser da kir
 Kelaşê der dên xwe l
 li ser milên bîranînên xwe dihilgirt
 li goristanekê digeriya
 Di nav leylana bê dawî de
 Li paş gerdûneke ne diyar û dîr

(5)

Maçek di hişê wêde digeriya
 Tenê xwe lidûv rewrewka wê didît
 Di şeqamên tinebûnê de digeriya
 Li morana mirovan digeriya
 Her tişt êdî bê renga
 Û bermayên bîranînan...
 Kara cûna bo cîhaneke
 Nenas û bê çarenûs dikin

(6)

Maçek xwe bi bihna xwe dorpêç dike
 Wê li şanoya şîniyê datîne
 Li kêlekê roj rêz di bin
 Dil nema tiktikê dikin
 Çav nema hêsiyan dirêjin
 Tenê wê dilopek hêsiyan rêt
 Wek lehiya pêleke rêbwarî qamda
 Di nav kefa wêde ...
 Hestan bi şûştinê aram bûn

Mûrûvet Y. Cacim

JI BO GIRTINA

ÇEVÊN TE DIMRIM



Çavên xwe negire tu caran veke carek din
 Ez şevederê kolanên çavên teme
 Wisa bi xemgînê li min nenihêre
 Di binê sîyên mijangan de
 Êrîşên çavên te hezdiki m
 Girtina çavên te min dike sêwî di kolanên de
 Disa jî benda dilovaniya çavên teme
 Hevîya min ji çavên te heye
 Hekim lokman e çavên te
 Bê kesara nistimane
 U bi wan cevan di jim nude
 Hicrana cane çavên te xemgînê dilaye
 Ji bo girtina çavên te di mirim
 Çavên xwe negire tu caran veke carek din
 Çavên xwe negre tu caran veke carek din
 Çavên te aliyê zindiye di bedena minde
 Ji ber bê dengiya min çavên xwe negre
 Bê dengiya min ji ber hevidariyên qediyayî
 U ji ber assêtiya dile
 Wek mermiya di lula mawzerê de
 Wek êşa bê derman wek romana nenivîsîye
 Wek strana nehata gotin
 Wek xeyala nehata hunandin e çavên te
 Ji bo girtina çavên te di mirim
 Çavên xwe negire tu caran veke carek din
 Çavên xwe negre tu carek din veke
 Nebe kul û derd li qiraxê vî dilê de
 Derguşa vî dilê de çavên te xwedi dikim
 Hestê min wetayê dilê çavên te ye
 Çavên te niştiman be ez şoreşgerim
 Ger welat be ez parêzê welatim
 Ger put be ez peresdarê wanim
 Ku evin be ew çavên te
 Ku qesasê seri min celladê canbe
 Ez bi dil û can evindarê wan celadame
 Ji bo girtina çavên te di mirim
 Çavên xwe negire tu caran veke carek din
 Çavên xwe negre tu caran veke carek din
 Çavên te xembira hezar salaye
 Birina ser lêvaye siruda niştimane

keşwer û qeleh e di dilên xembarda
 Diroka hezar salaye çavên te
 Diroka bêbext şirove dike nu hatiyara
 Heviyan mezindike peşerojêre
 Jiyana mine stewr de dibê keskesor
 Bilinbuna çahr duwarê kul derdan
 Eş û hewaran nimizdike ji minre
 Çavên xwe negre tu caran veke carek din
 Ji bo girtina çavên te di mirim
 Çavên xwe negire tu caran veke carek din
 Çavên xwe negre tu caran veke carek din
 Tovê min jî ji axa çavên te ye
 Bizanibe ku dilên şahbazin te di hewînin
 Ez şevederê kolanên çavên teme
 Hingi ketiye tora nezanan
 Xîzan sêwî buye û hatiye girtin
 Çavên xwe negre tu caran veke carek din
 Ez şevederê kolanên çavên teme
 Di binê sîyên mijangan de
 Êrîşên çavên te hezdiki m
 Çavên xwe negre tu caran veke carek din
 Ji bo girtina çavên te di mirim
 Çavên xwe negire tu caran veke carek din

Xerîbî

Li dinyayê em in xemgîn
 Me winda kir welatekî rengîn
 Ji bo me heps û zîndan
 Tu ferq nake welatê evdan
 Li ber sefera van kafira
 Me bîrva kiriye rûçikê xwîşk û bira
 Dê û zarok ji hev qetandin
 Êdî sebra me teqandin
 Dil û cergên me kirin xwîn
 Li benda me be welatê zêrîn
 Her tim di dilê me de ye ev evîn
 Şev û roj her em in xemgîn
 Dikim xem û xeyala te
 Bi fersehan ji min dîr î
 Nayem cejn û sersala te
 Birîna dilê min de ya herî kûr î
 Bi koletî û bi êsîrî
 Van helbestan ez di bêjim
 Li ser sêla agir im
 Can û cergên xwe dipêjim

Beyar Robarî

Birakê te nexweşe!

- Xelek 3 -

17

Min kehek ji xwe re derxist û paşe bidizî xwar, jiber zehmete li pêşiyê millet û li kolanê meha rojîyê xwarinê bixwe.

Min ji Şêx Mehmed re got: Birastî tu şerim nakî! Wî bi seyir û rûçikek xerab li min nêrî û got: Çima?

Min got: Te di jiyanê xwe de, kehikên wisa ji zarokên xwe re nekirîne. Lê ji şêx re tu tiştên herî buha dikirî! Ma şêx ji zarokên çêtir û pêştire? Deve lihivxist û gotinên vala kirin û got:

Na, lê belê em çawa desteboş herin serlêdana şêx?

Min bersîv da û got:

Em narne ba wî bi mêvandarî, çûyîna me ba wî jibo meselak berbiçave.

Wî got: Ez ne bigotina te re me. Divê em tişteki bdest xwe jêre bibin.

Min got: Başê, lê te tûrek dirêj û pehin tijî tiştîkirî eva nenormale.

Mirov here zemawenda kesekî wiqas tişt bixwere nabe. Ti têkeliya va tûrî toreyan re tune.

Wî xwe kerkir û li min venegrand. Min gûmankir kû ew jî mirûdê Şêx Husêne û şêx wan ji xwe bikartîne û pêdikene.

Dora nîrvo em gihîştin gundê Kurka û Şêx Mehmed kete pêşiya me û em lipê wî çûn ta em gihîştin cîkî û ew sekinî û got:

Ev mala Şêx Husêne.

Min li malê nêrî gelekî mezin û ciwan tê xuyaye. Şêx Mehmed li derî da û em sekinîn ta kesekî deriyê hewşê ji vekir û silav da me û yekser bixêrhatinê pismamê min kir!! Jibo bû min aşkrebû kû ew berê pir caran hatî ba Şêx Husêne û mirûdê wî ye.

Pismamê min jê pirsî û got: Şêx Husên li male?

Mêrik got: Na, Şêx li mizgeftê ye.

Keremkirin derbasbin ta şêx ji mizgeftê vedigere. Em derbasbûn û em birin odakê xuyakir oda mêvana ye. Wî mirovî tûrê kehkan û xurbê, ji dest pismamê min girt û bir kelingê an cîk din.

Pismamê min got: Hûn li vir rûnin, ezê herim mizgeftê li mêya xwe bikim û teve Şêx Husên ve gerim.

18

Min got: Başê pismam. Xuyaye tu rêya mizgeftê berê zanî. Ew kenî û zanî mebesta min çî ye!

Hundir malê gelekî hênk û pakbû ez hinekî ji bela germê vehesim û bi taybetî piştî min destserçavên xwe şuştin. Oda em tede rûniştinî zor ferebû û bawerim şêx tede sey didan.

Di wê navberê de çend mirovên din hatin û teve me li hundir rûniştin, hemî bi rî û fûtebûn û tibziyên dirêj bidest de bûn û navserbûn û bêlîbû ew mirûdên

Şêx Husên.

Piştî demekê Şêx tev mirûdên xwe ji mizgeftê vegeyriyan û dema bi hundirketin, em rabûn serxwe û me dest da Şêx Husên şêx û ew silavkir û diêre hevalên wî.

Şêx Husên li halê me pirsî û bixêr hatina me kir û berve ciyê xwe çû, da rune. Lê min bala xwe dayê, ew mirovên bi me re li hûndir, bezîn lingên şêx û maçkirin! Birastî ez gelekî metmayî mam û min ji xwe re got, lo ev çî ye?!

Piştî çend xulikan Şêx Husên li me nêrî û got: Hûn bixêr hatin.

Min got: Zor sipas.

Wî pirsî û got: Xarzê tu çî karî dikî?

Min got: Şêx ez mamoste.

Şêx Husên: Li ku derê?

Min got: Li Xalta.

Şêx Husên: Başê xarzê û birakê te çî karî dîke?

Min got: Ew hîn dibistana navendî dixwûne.

Şêx Husên: Ez serkeftinê ji we re dixwazim.

Pismamê min got: Şêx, mamoste hevalê Wehîde Coqê ye. *(Wehîd jî endamê komîta navendiya Partiya Komonîsta Sûriyê bû û wê demê endamê parlamênanê Sûriyê bû)*

Şêx Husên: Aha .. ger weye xarzê rojîyê nagire.

Şêx Mehmed: Na, ew rojîyê nagire, jiber baweriya wî bi olê nîne.

Min bala xwe dayê ew kesên li hundir, ger ji dest derên kanin we min bixwun!

Şêx Husên: Xwedê bi rûyê xarzê ve binêre û rêya rastiyê bervêke.

19

Şêx Mehmed: Amîn û Xwedê ji devê te bibhîse.

Paşê Şêx Husên bi merovekî re got:

Xwarinê ji xarzi min re hazirbikin, jiber xarzê bê rojî û birakê wî jî nexweşe divê ew nanî xwe bixwun. Bes we xwarin hazirkir bane xarzê kin da herin nanê xwe bixwun.

Min got: Şêx pêwîstnake, jiber hûn hemî bi rojîne û nexweşe ez û birakê herin nên bixwun!

Şêx Husên: Tişt nabe û hûn tim be bêrojîne, Çima hûn ke xwe bêxwarin bimînin!!

Şêx bane birakê min kir û got:

Xarzê biçûk were li kêlek min rune, da em sehkin dedê te çîye. Birayê min rabû û çû li tenîştê şêx rûnişt. Şêx destê xwe da ser serê wî û çend ayet binerm û kerî xwendin û paşê du'ha jêre kirin, nezêde û nekêm.

Di pêwê re şêx li ser rojî û girîngî û sudeya wê jibo mirovan. Û hemû beşdarên li wî guhdarkirin û tev jî

mirûdên wî, ji bilî me.

Demek dirêj nêcû peyakî Şêx Husên bane min û Rizgêr kir da em teve wî herin xwarina xwe bixwun.

Min biastî hinek şerimkir. Lê teve wî mirovî çûn odak din û me li wir xwarina xwe xwar û ava xwe vexwaû em vegeyriyan oda Şêx lê rûniştî tev mirûdan.

Wek min bala xwe da axiftina mirûdên şêx, xuya bû ew ji hemû navçeyên Efrînê bûn.

Berî demjimêr biçar bin me xatirê xwe ji şêx û kesên li hundir xwast û em birêketin û çûn ciyê bîkab û tirimbîl lê disekinin, ewin li ser rêya Efrîn û Kurka kardikin. Li wir em li bîkabekê siwarbûn û me berê xwe da bajarê Efrînê.

Duniya hîn germbû û toz û telaz bi barê bîkabê re radibû, jiber rêk bipiranî axbû.

Li ser rêkê min ji Rizgêr pirsî û got:

Tu sûda (fêde) şêx li te kir?

Wî bersîv da û got: Na. Tu sûde li min nekir.

Min got: Ez seyr nabînim, jiber şêx ti tişt nekir, ji bilî xwendina çend ayetan. Min jî kanî ji te re, çend ayet ji quranê ji te re bixwendina.

20

Û qet nepêwîstbû em bihatana ba şêx û me va cefa giştîk bidîya.

Lê ez bêm çî, bi anê û Şêx Mehmed re. Ev gotina min li xweşiya Şêx Mehmed neçû û ew hêrket û got:

Raste tu jî kanî quranê bixwûnî û ez jî kanim, lê belam tu nemelayî û nezanyarî.

Min got: Şêx, xwendina quranê bizanebûn û melatîyê re tune. Û du'ha kirin mirovî nexwende jî kane bike û ji Xwedê daxwazan bixwaze. Mela karê wî şiroveya quranê ye û fetwene.

Şêx Mehmed: Xwedê ke çawa daxwazên te bicîhûne û baweriya te, bi wî nîne?

Min got: Dilê min pake û nêta min jî saxe û ez bawerdikim ev bese.

Û ez nabêm Xwedê heye an jî tune. Jiber min belge tune jibo hebûna wî û tunebûna wî.

Şêx Mehmed: Na, ev nebes. Divê baweriya te bi Xwedê hebe.

Min got: Wê meselê berde û ji min re xeber de, çima hûn derin lingên şêx maçdikin? Û tu jî lingên wî maçdikî an na?

Şêx Mehmed: Jiber şêxê meye û aqilmedek mezine, loma em lingên wî maçdikin.

Min got: Ma qeyne Şêx Husên ji peyember Muhmed mezintire û qentire! Ma te bihist kesî lingên peyember maçdikirin?

Şêx Mehmed: Na, neji pêxember mezintire û min nebîhîstî kû kesekî lingên pêxember maçdikirin.

Min got: Ger weye şonde hûn çawa lingên şêx maçdikin! Ev koletî ye û ti têkiliya xwe bi ol û baweriyê re tune. Ger tu guhdariya min bikî tê dest ji vî karî berdî û rêzê xwe bigirî. Ew gelek xeyidî û sorbû û nizanî ke çî bike, loma neçar me xwe ker bike.

Di vê navberê de em gihîştin bajarê Efrînê û li wire m peyabûn û çûn geraca mikrobasên derinê Helebê. Dema em diçûn geraca mikrobasan min ji Şêx Mehemed re got:

Dê ka kehkina ji min re jî bikire, wek çawa ji Şêx Husên e kirînê. Û ger tu nekirî ez te di nav millet de pirçoskî bikim. Dema min ev gotina kir Rizgar ji kena re hişkbû û wî got:

Derdê kehkîn!!

21

Lê mixwebin wî kehk ji min re nekirîn! Em li mikrobasekê siwarbûn û piştî mikrobas tijîbû ew birêket. Li ser rêya Helebê min ji birakê xwe Rizgêr pirsî û got: Te şêx Husên çawa dît?

Rizgêr got: Ew ji şêx Mehemed baqiltire.

Ez kenîm û min got:

Pismam te bihîst Rizgêr çi got?

Şêx Mehemed: Belê min bihîst wî çi got. Goina xwe raste, jiber Şêx Husên ji min zanetire û loma ew şêxê mine, ne ez şêxê wî me!

Min got: Ya te jî raste pismam.

Şêx Mehemed: Tu çawa razîbûyî xwarinê bixî û millet hemî birojî ye?

Min got: Helbet min fedîkir. Lê te dît, şêx got divê em nanê xwe bixwun, jiber em bêrojî mne. Û paşê me li pêşiya we, xwarin nexwar. Ya duyemîn hûn rojîyê, ji xwe re digrin ne ji min re.

Dora demjimar şeşan hêvarî em gihîştin ser rêya gunde zaretê û li wir em ji mikrobasê daketin û bimeşe me rê şidand û me berê xwe da gund. Piştî demjimar û nêvekê em gihîştin gund. Li binê gund min got pismam tê teve me herî mal, jiber dayîk û babê min we bixwazin pirsna ji te bikin li ser çûndina me ba Şêx Husên.

Wî got: Ez dixwazim herim mal û fitaa xwe vekim û paşê ezê werim.

Min got: Na, tê teve me herî û li ba me fitara xwe vekî û paşê herî mal.

Wî got: Başê, mela bi a te be.

Min got: Sipas jibo razîbûna te.

Şêx Mehemed: Şaye nine.

Em yekser çûne mala me û me hemiyan, tevehev xwarina xwe xwar û dipêre ça, qehwe û şerbet vexwar. Û piştî xwarinê dayîka min pirsî û got:

Dê ka bêjin şêx çi got û ji Rizgêr çi kir?

Min besîva wê da û got:

Şêx Husên ke çi bibêje, wek em çûnê em wisa jî hatin. Wî bes çend ayet jêre xwendin û du'ha kirin.

22

Dayê: Çawa ti tişt jêre nekir?

Min got: Li gor te çi kane jêre bike, ji bilî xwendina ayetan?

Wê got: Ez çi zanim. Ê çawa şêxe û nikane tişteki bike!

Min got: Ger tu nizanî, çima tu serê mirov bixwere

dêşînî. Min ji destpêkê de bi te re got, em wî bibin ba bijîşk an nexweşxanakê. Lê te xwast em bibin ba şêx û min a te kir. Û tu dibînî çundin û hatina me li boşiyê bû.

Û ger neweye mela Şêx Mehemed guhdariya me dike, kane bibêje gotina min neraste.

Şêx Mehemed: Pismamê rastiyê dibêjeye. Lê belkî im çend roj gerekî ta du'hayên şêx encam bidin!

Min got: Ez bi va meselê giştî bawernakim.

Dayê: Tu sûde jê nedît?

Rizgêr bersîva wê da û got: Na, dayê min ti sûde jê nedît.

Dayîka min: Bes ayet jêre xwendin?

Min got: Bes.

Dayîka min: Çawa?

Min got: Şêx nebijîşke, da dermanî pêde an niştegeriyekê jêre bike.

Pir-pir kane çend ayetan ji kesekî re bixwûne.

Û xwendina quranê ez jî kanim bixwûnim. Lê te guhdariya min nekir.

III

Li dû Cejna Rojîyê min Rizgar bir ba bijîşkî derû nasînê (pisîkolog) li Heleb. Min li destpêkê rewşa

Rizgêr ji wî re xeberda û helwesta xweya taybetî li ser rewşa wî. Dipêre wî bi Rizgêr re denkir û gelek pirs jê pirsîn.

Demekê em hersê tevehev rûniştin û çaxê bijîşk bitenê bi Rizgêr re danîşt. Piştî wan hevdîtinan ez û dîktor carek dîn, bitenê bihevre rûniştin û ji min re got:

Birakê te derek xwe derûnasîn (nefsî) heye, nezêde û nekêm. Ew di ezmûnak taybet re derbasbûyî û divê em bizanibim çi ezmûne ye.

Û ew di bin pesta ve ezmûnê de dijî û hemû derdê wî di serî de ye. Jiber wê serî tim dêşe û gêje. Lê wî ji min re negot, çi vê re bûyî û biserî hatî. Lê ez bawerim ew di ezmûnak hestiyarî re derbasbûyî û ew têde biserneketî û gelekî ew pêhatî êşandin.

23

Û birîna derûnasîn pestek mezin dide ser mejiyê wî û divê ew, ji pest û hêza wê xelxas be.

Min got dîktor: Li gor te, evîn be?

Bijîşk: Serîsedî heystê tişteki wisaye.

Min got: Başê ew çawa kane, ji vê pestê xelasbe li gor te?

Bijîşk: Bendora axiftinê niha li ser wî kême. Divê em bi şoka elêktirêkî wî hinek vehesîn, ji wê pestê. Ligel şoka elêktirêkî ezê dermanî (tene) taybet pêdin û ez bawerim wê gelekî vehese. Dipêre rola axiftinê wê were.

Me li gor plana bijîşk daniyî, me destpêkir û hercar ez tevê amede dibûm. Dema şoka elêktirêkî bijîşk bikartanî, Rizgar li ser textekî dirêjdikir û ling û destên wî girêdidan û tişteki dikire nav diranan, da lêvên xwe gezneke û diranên xwe neşkên.

Me du mirovan bi bi Rizgêr digirt, gava bijîşk alava şoka elêktirêkî (aparât) dida ser cênên wî û radikirin. Dema ew alav didan ser cênîkan, Rizgar wek dîndan dibû û berxwedida kû rabe serxwe û me bizora ew digirt.

Piştî çend cara bijîşk ew, wisa şokir û berdewam Rizgêr deman dibir, ew yekser bişev yekser ew

bixeve diçû. Û me bala xwe dayê ew roj biroj pêşde dere û ji mal nareve û bişev kok dernetê û hêza wî kêmbû û hêdî-hêdî êşeka serî rabû.

Herwisa xwarina wî jî zêdebû û dandinûstandina xwe bi kesên dor xwe re jî baştir û bêtirbû. Dinavbera jivanekê ya dinve heftak hebû. Çareseriyê tevde dora mehekê berxweda. Wê mehê pêde li mala birayê min dima. Jiber tevayî rojê ez nikanîm tim li mal bimama û liba wî rûniştama.

Jina birakê min karnedikir û ew tim li malbû jiber wê, me ew li wir hişt.

Bijîşk perenî pir ji min birin, lê birayê min ji wa belê xelasbû û em jî tevê vehesiyên û vê qiswatbûn. Roj çûn û mehe hatin wî xebreda çi vêre çêbûyî û biserî hatî!

Piştî salekê ez ji welêt derktim çûm Almaniya Rojhilat bixwûnim.

Rojekê ez min birêya telfonê bi mal re dendikir û telfon li mala hingê li mala me tune bû.

24

Birakê min Çîlo lihat male cînarek me û wisa me bihevre dendikir û em li ser rewşa malê axivîn. Dinav axivtina dae got:

Bira tê têbîra te edema Rizgar nexweş bûyî û me nizanî çi derdî xwe heye?

Min got: Belê, têbîra min.

Çîlo got: Wî ji Nezîrê, qîza xalê dayîka min hezkirbû!

Min got: Tu rast dibêjî?

Çîlo got: Belê bira, ez rast dibêjim.

Min got: Nezîrê hajê hebû?

Çîlo got: Na, hajê tunebû, wî keregêjî jêre negotbû.

Min got: Jiber kû bêheşe loma. Ger nebêheşbûya wê bi keçkê re bigota an jî bi mine re, da me alikariyek jêre bikira an Nezîrê jêre bixwasta.

Çîlo got: Xelas, Nezîrê çû mêrkir. Bes min ji te re got, da tu bizanibî derdê wî çibû.

Min got: Bira ez bawerim, wî ji fedîbûnê negot an jî tirsî bi keçikê re li ser vê meselê denke. Gor Nezîrê qîza xalî anê ye.

Heya ev hal û rewşa meye, em nikanin tu gavan pêşde bavêjin û ji van nexweşiyên civakî xelasbin û neji rizgaribin.

Çîlo got: Gotina raste û di cî de ye, bira

..... Dawî.



Sernivîs

Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Xorşîd Şûzî

Desteya birêvebir

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn Şêxo

Pîr Rustem

Derhêner

Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhe mên kurdi:

kurdi.penusanu@gmail.com

Jimarên "Pênûsa Nû" Tev ji vî Emêlî derxînin:

www.penusanu.com

